

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

HAVÎN 2007



ŞAYÎYA 10-SALÎYA BÎRNEBÛNÊ

MEWLÛDA MELE ABDURRAHIM  
DI ÎSLAMÊ DE CENAZRAKIRIN Û  
PIŞTÎ WÊ. DI VÊ HELWESTÊ DE TORE Û

34

# bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.  
Sê mehan carê derdikeve/ Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 34, havîn 2007

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen  
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Seyfoye Asê, Vahit Duran

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Navnîşana li Almanyayê

Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln/Almanya

Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone (ji bo du salan - 2 yıllık bedeli):

Swêd: 400 SEK • Ewropa: 40 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası

M. Özgür, Stichwort "Birnebûn" Deutsche Bank-Köln

BIC: DEUTDEBKOE

IBAN: DE66 3707 0024 0591 2662 00

Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dağıtım

Türkiye

Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul:

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488




Dîmenek ji şayîya 10-saliya Birnebûnê

Foto: Anders Rydell

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re  
tên, serrast û kurt bike. Nivîs ger çap nebin jî, li  
xwedî nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û  
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



Wênêyên li bergê: 10-saliya Bîrnebûnê  
Foto: Anders Rydell



- 2 10-saliya Bîrnebûnê pîroz be! - **Ali Çiftçi**
- 3 Newroz li Stockholmê li belediyeya Botkyrkayê - **Mahmut Lewendî**
- 5 Pîrozbayiya 10-saliya Bîrnebûnê
- 6 Dehsaliya Bîrnebûnê di radyoya swêdî beşê kurdî de - Amadekar: **Amed Tigrîs**
- 18 Li ser 10 hejmarên Bîrnebûnê - **Nebî Kesen**
- 21 Malbata me pir mezin bû - **Muzaffer Özgür**
- 27 Bîrbûnê çi kir? - **Mem Xelikan**
- 28 Bîranîna 10-saliya Bîrnebûnê me li Stockholmê pîroz kir - **Altun Başaran**
- 30 Bîrnebûn; ji dur ve, li ser rê kovarek dibirîqî... - **Cüneyt Dağdalan**
- 32 Bîrnebûn bendeke li ber bîrbûnê ye! - **Nuh Ateş**
- 34 Xas bi me! - **İhsan Türkmen**
- 36 Bîrnebûn di hemêza „Kurdên Anatoliya Navîn“ da - **İrfan Baysal**
- 38 Çiroka min a Bîrnebûnê; ji ber devî gur - *Dr Fikret Yıldız* **Mîkaîlî**
- 45 Em gurçikeke Kurdistanê ne - **İrfan Baysal**
- 47 Li ser dehesaliya Bîrnebûnê - **Rebenî Celikan**
- 49 Li ser şeva “Bîrnebûn”ê - **Nebî Kesen**
- 51 Goştê xinzir - **Mem Xelikan**
- 53 Çêroka Hesî Lûlê - **Altun Başaran**
- 55 Bo dehsaliya Bîrnebûnê - **Hilmî Yeşiltaş**
- 56 Dayê - **Ramazan Kesen**
- 58 Gulsosina min - **Xizan Şilan**
- 60 Mewlûda Mele Adurrahîm - Amadekar: **Hilmî Yeşiltaş**
- 70 Cenazerakirin û piştî wê - **M. Huseyn Êsî**
- 74 „Hocaların hocası“ Bir Kürt aydını: Fani Efendi - **Mehmet Bayrak**
- 77 Bîrnebûn’un sunduğu gerçekler - **Mehmet Bayrak**
- 79 Bîrnebûn 10 yaşında - **Necip Demirsoy**
- 82 Kürtler, Anadolu ve Bîrnebûn - **Abdullah Kaya**
- 86 Nice 10 yıllar - **Çetin Taşçı**
- 88 İçtoroslar’da Alevi-Kürt kadın aşıklar - **Mehmet Bayrak**



## 10–saliya Bîrnebûnê pîroz be!

Erê, 10 sal xebateka bo ziman, berhevkirina folklor û çanda kurdî ku piraniya vî karî bi hesreta welêt, li derveyî welêt hatiye kirin, helbet ne hêsan bû. Sergêjî û kedek bêhempa di van 10 salan de, ji aliyê hinek heval û dostên Bîrnebûnê ve hate kişandin. Lê bi derketina her hejmareka nû, heyecan û quweteka nû peyda dibû û ew sergêjîyên ku di nav xebatê de peyda dibûn ciyên xwe ji dilşahî û aramiyê re dihişt.

Piştî van deh salan em dibînin ku hê pir pêwîstiya karên wiha heye û em çiqas dereng mane!

Di vî warî de ev gavek pir biçûk be jî, ji bo vê xebata pîroz ku sibê neslên nû dê kelk jê werbigrên, misyogeriyeke girt ser milên xwe!.. Em niha, piştî deh salan dibînin ev gava ku ji aliyê çend kesan ve hatiye avêtin, îro ji bo xelkê me bûye hêviyeka mezin, bi sedan kes bûne piştgirê vê û hê bi hêvi û daxwezên din ve nêzî meselê dibin!..

Xwendevanên ezîz, hûn ê di vê hejmarê de bi piranî nivîsên li ser kovarê û 10-saliya wê, ji pênûsên cûda bibînin. Heryekî ji pencera xwe ve li meselê mêze kiriye; hinekan pesn û hineka jî rexne kirine. Pesn û rexnên di cih de hene û yên ku li gor me, ne di cih da ne jî hene. Em bi rihetî dibêjin: ew her bi çi rengî bin jî, ji bo pêşdaçûyina kovarê û ji dilpakî-

yê hatine kirin. Ev rexne ji bo me serbilindiyek e ku ji kovarê hêvi û daxwezên din tînin kirin. Kovar bi çavekî rexnegirî tê xwendin. Ew jî dê ji pêşdaçûyîna kovarê, xwenûkirin û hîn aktualize kirine re, rê veke.

Barê kovarê her ku diçe girantir dibê! Karê profesyonelî, kadroyên nû ji bo nûkirina kovarê, ji bo pêşeroja kovarê pêwîst in! Eger ji neslê nû kadroyên profesyonel nekevin nav vê xebatê dê aqîbeta Bîrnebûnê jî bibe aqîbeta kovarên din, ên kurdan ku tu careka din nikaribûne ji nû ve weşandina xwe bidomînin!..

Ji ber vê yekê jî, ji îro de berpirsiyariya me giştîkan ew e: em tenê bi kadro, nas û dostên li der û dora xwe ve nemînin û ji bo xebateka hîn bi rêkûpêk ji neslê nû însana bikişînin nav vê xebatê.

Dewleta Tirkîyê bi sedema biryara Şaredariya Sûrê ya ”*Di kar û xebatên şaredariyê de pîrzimanî*” Şaredarê Sûrê yê Amedê, birêz Abdullah Demîrbaş û hemû endamên meclîsê ji wazîfê girtine.

Li dij vê birayara nîjadperest divê kurd li herderê, bi înat û serbilindî, zimanê xwe hîn pir bikar bînin û qîmeteka bilind bidin zimanê xwe!.. ji ber ev bîryara dewletê biryareka li dij kesayetîya hemû kurdan e!

Ali Çiftçi



## Newroz li Stockholmê li beledîyeya Botkyrkayê



Dîmenek ji şênawiya newroza belediya Botkyrkayê

Li bajarê Stockholmê li belediyeya Botkyrkayê newroza 2007an bi çoşeke mezin hat pîrozkirin.

Di newroza îsal de li gel dê û bav û zarokan nêzî 300 kes beşdar bûn.

Destpêk bi strana bi navûdeng ku teksta wê ji alî şairê mezin Pîremêrd ve hatîye nivîsîn "Em rojê salî tazeye Newroz hatewe" dest pê kir. Piştî stranê mamoste Celal Sönmez peyivî. Mamoste Celal Sönmez bi kurdî (kurmancî, soranî) û bi swêdî axifi û di axaftina xwe de bixêrhatinîya herkesî kir. Pişt re rektorê Fitjaskolanê Eric Rudholm bi swêdî axifi û di dawîya axaftina xwe de bi kurdî got "Hûn bi xêr hatine, newroza we pîroz bel!". Piştî

axaftinan grûpa govendê ya Omeran li gel muzîka herêmî govendeke bi kêf û çoş girtin.

Di dû wan re li ser navê Beledîyeya Botkyrkayê mudirê beşê kultur û ziman Josef Kusz axifi. Wî jî di axaftina xwe de behsa dukulturî û feydeya duzimanîyê kir.





Mamoste Celal Sönmez bi şagirdên kurd ên belediya Botkyrkayê, di şênawiya newrozê de



Pişt re xwediyê weşanxaneya APECê Alî Çiftçi axifi.

Alî Çiftçi li ser navê APECê nêzî 300 pirtûkên kurdî pêşkêşî zarokên kurdan kirin. Li dû axaftina herdu berêzan, govenda grûpa Keçikên Omeran derketin sehnê govend girtin.



Mamoste Mehmet Balta çiroka newrozê bi slayt nîşanî zarokan da.

Şagirdêkî soranîaxêf Saad jî helbestek xwend. Şagirdêka din Sana, wê jî stranek xwend. Li dû wan Grûp Kurdistan ku ji zarokên temen mezin pêk hatibû govend pêşkêş kirin. Di dawiyê de jî zarok û dayik û bav û mamosteyan bi hev re govend girtin.

Li gel şeker û şîranî û kulîçe û çay û qahweyê, her zarokêkî kitêbeke kurdî û qelemek wek diyarî girt.

Ev şahîya newrozê ji alî mamosteyên kurd ên li Belediyeya Botkyrkayê kar dikin ve hat amadekirin. Mamosteyên amadekar ev in: Celal Sönmez, Misto Birodrêj, Nevîn Baysal, Mahmut Pakdemir, mamoste Êran, Mehmet Bozan, Mehmet Balta û Faîze Nikdin.

*Nivîs û wêne: M. Lewendî*

# PÎROZBAYÎYA DEHSALÎYA BÎRNEBÛNÊ

Pîrozbayiya 10-saliya kovara Bîrnebûnê di 29 ê nîsanê, roja yekşemê li paytexta Swêdê, li Stockholmê, di Restauranga Mozaîkê de, şênawîyeka bi xwarin, vexwarin û muzîkê dehsaliya xwe pîroz kir. Ji Swêdê û ji welatên cuda yên Ewropayê; ji Danmark, Almanya, Îsvîçre, Norvecê û ji welêt jî hin kurd bi taybetî jî kurdên Anatoliyê amadeyî şênawiyê bûn.

Wekî din nunerên hukumeta Kurdistanê nivîskar, rewşanbîr û siyasemedarên kurdên li Swêdê jî di şênawiyê de amade bûn.

Pîrozbayiya 10-saliya Bîrnebûnê bi beşdariya dengbêj û hunermendên

ji Anatoliya Navîn: Bayram Özcan, Cengiz Acar û ji gruba wî Yaşar û Serdar, Haymanali Zeliha, Gursel Qemerî û Cejno çoşek mezin dan şevê. Ji derveyî hunermendên şevê, ji hunermendên mêvan jî, wek Beyto Can reng dan şênawiyê.

Di şênawiyê de xelata kurteçîrokan jî hat belav kirin. Herwiha cilûbergên jinên kurdên Anatoliyê jî hatin nîşandan.

Şahîya 10-saliya Bîrnebûnê bi beşdariya 400 kesî ku ji her gund û bajarên Anatoliya Navîn hatibûn ve di atmosfereka germ û xweş de heta saet 02.00 an berdewam kir.

## Agahdariyeke biçûk

*Nivîskarên hêja!*

*Em careke din bi xemgînî dibêjin ku hinek nivîsên ji bo Bîrnebûnê tên, me gelekî meşqûl dikin. Meşqûliyeta zêdetir jî ji ber wan îşaretên klaviyeyên cuda, prensîbên rêzimanên cuda ne ku li hinek welatan cuda cuda bi kar tînin. Lê Bîrnebûnê jî weke hemû kovarên Kurdistanê prensîbên nivsandina giştî ji xwe re kiriye pîvan û em li gor wan diçin. Ji nuxte û virgulan, ji nav û îşaretên wekî din, heta klaviyeyên wî zimanê ku hûn pê dinivîsîn...  
(kurdî an jî tirkî)*

*Hêviya me ew e ku hûn careke din bala xwe bidin rûpelên Bîrnebûnê û beta ku ji destê we bê, îşaretên rast, klaviyeyên rast, alfabeyên rast bi kar bînin ku li gor qaîde prensîbê nivsandina kurdî û kovarê be.*

Redaksiyona Bînebûnê

# Dehsaliya Bîrnebûnê di radyoya swêdî beşê kurdî de

Zana Serîn di radyoya swêdî beşê kurdî ku navê we radyoya Zayele ye de wek rojnameger kar dike. Ew bi xwe ji Amedê ye û zavayê kurdên Anatoliya Navîn e. Ew jî beşdarî şahiya şeva Bîrnebûnê bûbû di şevê de bi gelek berpîrs û mêvanên şevê re peyivîbû. Wî di roja 17ê gulana 2007an de li ser şeva şahiya û Bîrnebûnê bernameyeke bi kurdî amade kiribû û weşandibû. Me ew bername kire nivîs û em li jêr peşkeşî we dikin.

*Îro pêncşem 17ê gulane 2007. Navê min Zana Serîn e û hûn guhdariya weşana kurdiya radyoya Swêdê Zayele dikin. Di programa me ya îroyîn de mijareke bi tenê heye. Kurdên Antoliyê û kovara wan Bîrnebûn. Em niha li ciyê şahiyê ne, ez ji keçika ku bernameya şahiyê pêşkêş dike dipirsim ka ew kê ye, çi ye û di bernameya şahiyê de çi hene?*

– Navê min Hediye Guzel. Ez li Swêdê hatime dinê. Ez ji Qonyayê ji gundê Omera me. Îşev em ji bo Bîrnebûnê li vir in. Em 10 saliya Bînebûnê pîroz dikin.

– Çi di bernameya we ya îşev de hene?

– Di programa me de muzîk pir e. Ji bo ku şeveke kulturî û hunerî ye. Gursel heye, Cejno heye û Zeliha û Bedel hene û em ê çend xelatan bidin. Xelata kurteçirokan bidin û çend helbestan em ê ji Mem Xelikan bixwînin. Ew jî ji kurdên Anatoliyê ye. Belê dê şev weng xweş be!

– *Birêz Hediye tu bi xwe çi karî dikî?*

– Ez wek presskretera ji partiya Çep a Swêdê re dixebitim.

– *Belê, guhdarên hêja wek we jî guh-*

*darî kir Hediye Guzel pêşkêşkara şahiyê vê şevê ye. Kurdên Anatoliya Navîn bi mebesta dehsaliya kovara Bîrnebûnê li taxa Bredenga Stockholmê civiyane. Bi muzîk, stranan û xwendina helbestan, xwarin û govendê wan vê kovara ku bi nasandina nasnameya wan bi xwe bûye sedema nasnameya wan pîroz kirin. Weşanger Elî Çiftî destpêk û derketina kovara Bîrnebûnê tîne bîra xwe û weha bersiva pirsên min dide:*

– Di sala 1995–1996an de grûbek ji kurdên Anatoliya Navîn li Almanyayê civibûn. Ji wan kesan yê ku navên wan tê bîra min, niha jî hinek di nav redaksiyonê de ne û hinek jî îro ne di nav de ne. Ew civibûn, piraniya wan ji berê ve di nav hezên me yê siyasî de kar kiribûn, piştî hewqas salan gehiştibûn wê qenetê ku pêwîstiya nasandina kurdên Anatoliyê bi şeweyek dîtibûn. Ji we civinê tiştê jê derneketibû. Cara peşî di sala 1997an de hevalê me Hecî Erdoğan bi însiyatîfa xwe li Stanbulê hejmara yekem bi kêmasî be jî derxistibû.

– *Hejmara peşî li Stanbulê derketiye?*



– Belê hejmara yekem li Stenbulê çap bû. Nivîskarên wê hem li welat bûn û him jî li derî welat bûn. Armanç ew bû ku li welêt vî karî bikin, lê hat xuyakirin ku heta ew hejmar derket bi ser re şeş meh derbas bûn. Welhesil ku derket bi şûn de, di 1997an de hevalan bi min re têkilî danîn. Dema ku min hejmara yekem dît ez gelek pê kêfxweş bûm. Ez di hejmara duduyan de tev redaksîyonê bûm. Piştî hejmara duduyan me kovarê anî Stockholmê û ew roj ev roj e ku li Stockholmê derdikeve.


– *Belê nivîskarên wê bi tenê ne li Stockholmê ne?*

– Na, piraniya nivîskaran li welêt û derê Stockholmê ne. Lê piraniya wan kurdên Anatoliyê ne. Ji derî kurdên Anatoliyê kurdên me yên din jî dinivîsin.

– *Yên ku li Anatoliyê dijîn jî di nav nivîskarên we de hene?*

– Belê yên ku li wir dijîn jî hene. Di redaksîyona me de hene, di her hejmarê de bi kêmasî di du–sê nivîs ji welat tîn.

*Nivîskar û xebatkarên Bîrnebûnê wek torekê wek netverkeke kar dikin. Hem nivîskar û hem xwendevan li çar dorên cîhanê belav in. Bîrnebûn di vê rewşa belavbûyîna de dibe wekî navendekî wek kesên ji hev dûrketî, bi hev ve girê bide. Bîrnebûn qedera û çîroka sirgûniyan ku wekî eynîkek şikestî perçe perçe bûye bi hev ve dizelqîne ku her kurdekelî Anatolê û herweha kurdên din di vê eynîkê de ka-*



Hediye Guzel bernameya şahiyê pêşkêş dike.

*ribe dîmena xwe ya herî zelal û tam bibîne. Ez niha nêzikî pîrsa xwe ji endamekî redaksîyonê dikim. Tu dikarî xwe bidî nasandin?*

– Merheba navê min Muzaffer Ozgur e. Ez li Almanyayê dijîm û ji wir hatime şahiya Bîrnebûnê. Ez di redaksîyona Bîrnebûnê de me.

– *Bîrnebûn ji bo çi girîng e?*

– Bîrnebûn ji bo em dîroka kurdên Anatoliya Navîn, bi devokên wan bikşînin ser kaxizê ku di dîrokê de cihê xwe bigre.

– *Niha 10 sal derbas bûn, gelo hûn gihan çi encamî?*

– Bi 10 salan şûn ve em dor aliyê xwe dibînin ku kurdên Anatoliya Navîn bi kurdî dinivîsin. Bi kurmanciya me



Foto: Anders Rydell

Hemîd Atmaca û Mehdi Zana

dinivîsînî. Dor aliyê 30 - 40 kes bi kur-  
mancî dinivîsînî û em di kovarê de çap  
dikin û di malperên Anatoliya Navîn  
de diweşînin. Di malperên gundên me  
de sempatiya ciwanan çebûye û zimanê  
kurdî bi nivîskî bi pêşte çûye.

– *Xwendevanê wê gelek in, xelk pir  
dixwîne?*

– Kurdên me bi kurdî dikarin deng  
bikin lê nivîsandin û xwendin pir kê-  
m e. Me ekolek ava kir. Em bi serketinê  
lê xwendin di nav kurdan de kê-  
m e. Lê disan jî pê re mijûl dibin, lê dinêrin.

– *Tu bi xwe bêtir li ser çi dinivîsî?*

– Wele, ez li ser komelên kurdên  
Anatoliya Navîn dinivîsînim. Çîrokan  
dinivîsînim. Her kar û barî dikim.

– *Te di hejmara dawî de çi nivîsan-  
diye?*

– Kurdên Anatoliya Navîn li Ewropa  
komeleyên xwe ava dikin, ez wan ko-

meleyan didim nasin. Di her hejmarek  
an jî her du hejmaran carekê ez kome-  
lan didim nasandin. Çi dikin, çi nakin,  
ji kîjan gundî ne. Di aliyê ziman de, di  
aliyê kultura kurdên Anatoliya Navîn  
de, di komeleya xwe de tiştêkî dikin,  
nakin. Ji bo zarokan, ji bo ciwanan jî  
bo jinan em wan tînin holê. Ez wan di-  
nivîsînim. Em di nivîsên xwe de beh-  
sa ziman, rewşa Kurdistanê yanî welatê  
me yê Jêrî jî kir. Em ji Kurdistanê re  
dibêjin **Welatê Jêrî**. Piştê me dît ku li  
dor aliyê me nivîskar hene, nivîskarên  
ji Kurdistanê hene. Li nav kurdên  
Anatoliya Navîn de dijîn, em wan baş  
nas dikin. Wana jî me re nivîsin û we-  
ha têkiliya me çebûn û xurt bûn.

*Piraniya kurdên ku ji Anatoliya  
Navîn derketine sirgûna duyemîn, hati-  
ne Swêdê. Yek ji wan kurdên Anatoliya  
Navîn ku di nav yên ku cara pêşî hatine*



Foto: Dr Mikaili

Yusuf Güler

*Swêdê de, di vê şeva Bîrnebûne de amade bû. Ez ji yekî dipirsim, tu dikarî xwe bidî nasandin?*

– Navê min Hecî Baysal e. Ez di sala 1969an de hatim Swêdê. Li aliyê me cîranê me hebû ew hatibû Swêdê. Bi riya wî birayê min hat û piştê jî ez hatim Swêdê.

– *Dema tu li gund bû, di derheqê Swêdê de çi dihatin gotin?*

– Wele digotin cihê Swêd baş e. Kar heye, pere qezenc dîkin. Wusa bû.

– *Çima wê demê rewşa ekonomîk li aliyê gundên Anatoliya Navîn xerab bû?*

– Wê çaxê gelek xerab bû. Ji aliyê ekonomîk ve tengasî û kêmasî hebû.

– *Tu dema hatî Swêdê cara ewil mala te li ku bû?*

– Ez li Stockholm li Odengatanê dimam.

– *Baş e, te çi kar dikir?*

– Min li fabrîka Electroluxê kar dikir. Zimanê swêdî fêr bûm û piştê min zarokên xwe anîn.

– *Te jî kesek din anî Swêdê?*

– Min lawê birayê xwe anî?

– *Yanî her kesî ku hat çend kesên din jî bi xwe re anî?*

– Rast e, wusa bû.

– *Îro jî malbata te çend kes li Swêdê hene?*

– Wele... em gelek in.

– *Tu dikarî jimarek bidî, ka çend kes in?*

– Bi ser sedî ve hene.

– *Hinek kes hene dema ku demeke*



Zeliha ji Heymaneyê (Haymanalî Zeliha)

*dûr û dirêj ji welat dûr dimînin, gelo li cem we çawa ye?*

– Wele li cem me, me qet jî bîr nekîr. Em wekî li gund dijîn weha li vir jî dijîn. Li malê weha ye û li der ve jî swêdî çawa dijîn yê me jî weha ye. Gerek wusa be!

– *Hûn bi zarokên xwe re bi kurdî deng bikin?*

– Erê, em li mala xwe bi kurdî deng dîkin. Ji sedî sed bi kurdî. Ez bi torinê xwe re bi kurdî dipeyivim.

– *Tu carnana Bîrnebûnê dixwînî?*

– Ez dixwînim, ez ji sazkarê wê yek im.

– *Niha 10 sal derbas bûn, bi dîtina te tiştê herî baş ku we bi dest xist çi bû?*

– Me kultura kurdên Anatoliyê parast. Em kultura xwe li vir jî diparêzin.

*Her ku dem derbas dibe, şahiya Bîrnebûnê ya li Stockholmê geştir dibe.*



Cejno

*Niha dor hatiye ser belavkirina xelatên çîrokên xwendevanan. Yek ji xelatgiran ku li Anatolê dijî, nikaribû di vê şahiyê de amade bibe, mesaj sandiye û mesaja wî tê xwendin. Belê em niha gudariya mesaja wî bikin:*

Mêvanên hêja, ez ji we re silavên germ û dostanî ji Enqerê dişênim. Min bihîst ku min di peşbirika kurteçîrokan de xelata sisiyan bi Abdurrahman Duran ve bi par kiriye. Zor spas ji we ra. Ez dixwazim bi zimanê dayikê xwe

binivîsînim. Bijî zimanê me kurdî! Bijî Bîrnebûn.

*Gelo kovara Bîrnebûn çi cudayetiya xwe ji kovarên kurdîyên din hene? Çi babet wê dikin spesîfîk? Me ev pirs ji nivîskarê kurd ji Hesênê Metê kir. Ku ew bi xwe wekî kurdên Welatê Jêrîn vexwendiyê vê pîrozbahiyê bû.*

– Bîrnebûn ev 10 sal e ku wek gelek kêrbar kovarên kurdî peryodîk di wextê xwe de derdikeve. Ez bawer im tenê çend kovarên kurd peryodîk derketine û salên xwe tijî kirine; lê Bîrnebûnê jî ji wan spesîfîkên ku mirov bibêje peryodîk derdikeve, salê çar hejmar. Ev avantajê ku Elî Çiftçi xwediyê wê ye an jî berpirsiyarê wê ye. Û çapxane heye. Ji aliyê naverokê ve xasiya kovara Bîrnebûnê bêtir ji bo kurdên Anataoliya Navîn e: ji xwarinên wan, ji zarê zimanê wan, ji koçberiya wan, ji gundên wan... Çend mal in û ji kîjan beran in û ew ber ji kîjan eşîran in û ew eşîr ji ku hatine. Li gor îmkanên xwe hemû li ser kurdên Anatoliya Navîn in. Îca bi zimanê xwe, bi helbestên xwe heta bi



Dîmenek ji şahiya 10-saliya Bîrnebûnê.



aksenta ku ew bi kar jî tînin. Ev hemû dihêle ku meriv bibêje ev kovar spesifik e, bêje ya kurdên Anatoliya Navîn e. Mîna ku îdentîfeya xwe jî, şexsiyeta xwe jî dikarin di vê kovarê de bibînin ji bo wan bûye tiştêki palpişt û baş û...

– *Bi ya te, ku kovareke din li ser herêmeke din ya Kurdistanê hebe, dê bi ser bikeve? Wek mînak mirov bêje kovarek li ser Mêrdînê hene?*

– Na, ez bawer nakim, ev kovar bi tenê ne meseleya lokalî ye. Ev bêtir mesela kurdên Enqerê, Qonyayê, Qirşehîre, Nevşehîrê hene... Kurdên ku bi zû ve li wan deran belav bûne. Ev taybetî yên wan in. Lê mesela ku tu bêji bila kovarên lokalî bin, wek Mêrdînê, Batmanê wek Diyarbekirê bin, ez bawer nakim wek Bîrnebûnê bi ser bikeve. Ji ber ku niha yekî mêrdîni jî xwe ne bi tenê wek lokali di çerçeva merdînê dibîne, ew xwe wek diyarbekirî dibîne. Lê yên me yên Anatoliyê, bi taybetî gişt xwe bi vê kovarê wek Kurdên Anatoliya Navîn dibînin. Niha wusa bûye ku wek eyaletekê ne di nava xelkê de.

– *Ji bo çanda kurdî çi mîras li dû xwe dihêle?*

– Wele ji bo çanda kurdî du tiştên girîng dihêle him ji bo kurdên Anatoliyê bi xwe û him jî bi giştî ji bo hemû kurdan. Em bêjin kurdekî Anatoliya Navîn di wexta xwe de çûye Amerikayê, îro dema di Bîrnebûnê de stranên wan, xwarinên wan, kincên wan û malbatên wan bibîne, întreseya wî kurdê li Amerikayê



Badel (Bayram Özcan)

ku ji Anatoliya Navîn çûye, her heye. Lê ji bo me yanî kesên ku ji derveyî Anatoliya Navîn in, ev hemû weke pakêt malûmatên derheqê wan e ku em pê dibin xwediyê agahdariyên baş.

*Ez dîsa bi ser berpîrsê kovara Bîrnebûnê birêz Elî Çiftçi ve vedigerim û jê dipîrsim. Belê birêz Elî Çiftçi, îro traja Bîrnebûnê çi qas e?*

– Di destpêkê de piçek zêde bû he-ta 1500 jî hatiye çap kirin. Lê îro em 1000 çap dikin.

– *Bi ya te Bîrnebûn mîraseke çawa ji çanda kurd re dihêle?*

– Ji bo me tiştî herî balkeş an jî ku em girîng dibînin ji berhevkirina folklorê kurdî ji nav kurdên Anatoliya Navîn e. Ev jî bi xwe re ew mîrasa ku di nav kurdên Anatoliya Navîn de maye, çi ji aliyê ziman de be, çi ji aliyê kultur ve be, çi ji aliyê edet de be, berhevkirina wan tiştan e û ev jî gelek girîng e. Ez bawerim di vî alî ve kovara



Foto: Dr Mikaili

Dîmenek ji şahiya 10-saliya Bîrnebûnê.

me bi giştî serkeftî ye. Di mesela ziman de jî helbet gelek gavên nû avêtine û ji vê sedemê ji sedan zêdetir kesên ku ji Anatoliya Navîn in bi kurdî dinivîsînin hene. Yek ew cesereta bi zimanê xwe dengkirin hatiye holê,

ya dudu naskirina nasnameya xwe bi peşketiye û xurt bûye û ya sisêyan jî êdî însanên me dikarin bi zimanê xwe, xwe îfade bikin. Dixwezî bi zimanê xwe dîroka xwe bi xwe binivîsînin. Li derveyî kovara Bîrnebûnê jî gelek malperên gundên kurdên Anatoliya Navîn di înternetê de çêbûne û îro hewldaneke bi kurdî dengkirin di nav rewşenbîrên kurdên Anatoliya Navîn de xurt bûye. Ev jî bo me serkeftinek e.



Foto: Dr Mikaili

Gozel Cizîrî: ji Omeran yeka ku cara pêşî bi aliyê Kurdistanê re zewiciye, ez bûm.

*Bîrnebûn gotinek bi du wateyan e. Ew kurdên ku bi sedan salan in ji welatê xwe hatine koçkirin, dibêjin ew nehatine ji bîrkirin. Lê di Bîrnebûnê herweha ew dixwazin bibêjin ev surguniya xwe ji 300 salan ve dîsa wan Kurdistanê xwe, zimanê xwe û çanda xwe tucar ji bîr nekirine. Cara yekem piştî sedan salan kurdên Anatoliya Navîn û Kurdên Welatê Jêrîn di surguneke weha de dîtî û gihan hevdu dan û standinên kurdên*

ji Kurdistanê û yên Anatolê xurt bûn. Ez niha ji çend mêvanan dipirsim, navê te çi ye?

– Navê min Gozel Cizîrî ye. Ez ji gundê Omeran me.

Ez ji yê cem wê rûniştî dipirsim:

– Navê min jî Mustafa Cizîrî ye û ji xelkê Mêrdînê me.

*Belê li Swêdê di sala 1984an de di nav kurdên Anatoliya navîn û Kurdistanê de zewaceke yekem çêbû. Kurdên Anatoliya Navîn hatin Swêdê û dibe ku cara yekem kurdeke Anatoliyê bi kurdekî Kurdistanê re zewicî, we herduyan çawa hevdu nas kir?*

Gozel:

– Em herdu bi hev re dişixulîn. Ez dikarim bêjim ku ji Omeran yeka ku cara pêşî bi aliyê Kurdistanê re zewicîye, ez bûm. Tişteki baş bû. Bavê min jî di sala 1965an de hatiye vir. Ew jî ji wan kurdên ku cara pêşî hatiye Swêdê, yek e. Ez bi xwe jî bi zaroktî hatim vir. Em ji sala 1973an ve li vir in.

– *Hûn kîjan salê zewicîn?*

Mustafa Cizîrî:

– Di sala 1984an de.

– *Çawa bû?*

– Me bi hev re li herêma Fîtyayê kar dikir, wê çaxê. Me hev nas kir, min dît kurd e û me ji hev hez kir. Piştî me biryara xwe da ku em bizewicin.

– Yanî tu bûyî zavayê yekem ê kurdên Qonyayê?

– Ez bawer im, erê.. Weha ye. Niha sê zarokên me hene. Keçika me ya me-



*Ji çepê: Aysel, Rojîn, Evîn û Altun bi cil û bergên kurdên Anatoliyê zin Sorgul niha diçe unîversîteyê dixwîne. Fîrad lawikê me, ew jî salekê jê biçûktir e, ew jî unîversîteyê dixwîne. Lawikê me yê biçûk Rodî ew jî 14 salî diçe dibistanê.*

– *Gozel tu cara yekem kengê çûyî Kurdistanê?*

– Di 89an de piştî ku em zewicîn, du zarokên min jî çêbûbûn, cara yekem ez çûm Mêrdînê. Berê wê jî ez her sal diçûm gundê Omeran.

– *Mustafa tu kengê çûyî Qonyayê cara pêşî?*

– Cara pêşî, ez bawer im sala 91ê bû. Ji wê pê de di sala 2001ê çûm.

– *Baş e, Gozel niha tu çi karî dikî?*

– Niha ez wek tercûman dişixulim. Tercûmaniya bi kurdî û tirkî dikim, helbet ji bo swêdî.

– *Mustafa tu çi karî dikî?*

– Ez mamostetiyê dikim.

*Belê gubdarên hêja em bernameya xwe bi strana Rindê diqedînin. Strana Rindê ji herêma Qonyayê ji dengê Serap Sonmez.*

**Amadekar: Amed Tîgrîs**

## KURDISTAN REGIONAL GOVERNMENT (KRG)

### NORDIC REPRESENTATION

#### **Bo- berpirs û endamên rêdaksiyona kovara Bîrnebûn ên berêz**

#### *Silavên biratîyê*

Bi minasebeta 10 saliya kovara we Bîrnebûn ê, li ser navê nûneratiya hikûmeta herûma Kurdistanê ya Bakûrê Ewropa pîrozbahiyê li berpirs û hemû endamên rêdaksiyona kovarê dikeyn. Herwisa bi rêya we pîrozbahiyên xwe ji bo xandevanan û hemû wan kesên di kovarê de xebatên wan hene, dişnin.

Kovara bîrnebûn di van 10 salan de xizmetên hêja û giranbuha ji ziman û kultura kurd re bi giştî û bi taybetî ji kurdên Anatoliyî re pêşkeş kirin. Gelek kesan ji me bi rêya kovara bîrnebûn ê zanîyarî û şarezayî li ser dever û jiyana civakî ya kurdên Anatoliyayê peyda kirin.

Carek din 10 saliy kovara Bîrnebûn ê pîroz be û bi hêviya ku gelek salên din ji bo xizmetkirina kultur û zimanê kurdî li ser xebata xwe berdewam be.

*Nûneratiya hikûmeta herêma Kurdistanê  
ya Bakûrê Ewropa  
29-4-2007*

---

**Address:** P.O. Box 7127, SE-170 07 SOLNA, SWEDEN

**Phone:** +46 8 442 05 05 **Fax:** +46 8 442 09 05

**E-mail:** [nordic@rp.krg.org](mailto:nordic@rp.krg.org)

[www.krg.org](http://www.krg.org)



## **Mîvanên birêz, hevalên delal!**

Şeva we baş, dîlana we xweş be!.. Şahiya we ya salvegera deh salîya Bîrnebûnêpîroz dikim. Bi alîkariya we, bikedahevalêndi redaksiyonêde, bi hewldana nivîskar û xwendevanan, Bîrnebûn gihîşte deh salîya xwe. Bi 33 hêjmarên hatinî weşandin, Bîrnebûnê; ji bo dîrok û kultura me kar û barekî bê biha bi cih anî. Mala we ava be. Ji bo pîrsgirêkên min ê şexsî, ez ne li cem we me. Lê, dilê min bi we re ye.

Bi xelata duwemînî ya kurteçîrokan ku we ez layiq dîtîme, jê kêfxwaş bûm.

Ji Bîrnebûnê re emrekî hê dirêj dixwazim.

Dîlana we xwaş be.

Silav û hurmet!..

**Mem Xelîkan**

## **Merhaba Keke Eli,**

Ez hevidar im ji bo bersiva dereng kusura min mez nekî. Min 10 roj ber niha (17.04.2007) emeliyata duyemin derbas kir. Tenduristiya min niha baş e. Doktor dibêje; rewşa min da astengi neman.

Rapora patoloji ji baş derketin. Sibe ez dest bi kare xwe dikim.

Ji bo 10-salîya Bîrnebûnê ez kefxweş im.

Dilê min pir dixwest ez jî îro li ba we û bi hevalan re bûma.

Lê tenduristiya min imkanê nade.

.....

Silav ji dilê min,

ji Bîrnebûnê ra, ji te ra û ji hevalên delal ra.

Avukat, Levent KANAT

## Li ser navê redaksiyonê dengkirina Ali Çiftçi ya pîrozbayiya 10-saliya Bîrnebûnê

Mêvanên bi rûmet, heval û dostên delal, xwişk û birayên hêja, hûn giştik bi xêr hatin!

Îro em bi hev re, bi dilekî xweş, di roja pîrozbayiya kovara Bîrnebûnê de, deng û awazên kurdên Anatoliyê ji dengbêjên kurdên Anatoliyê, bi xwe guhdariyê bikin.

Bi kilamên xwe yên folkorîk, şîna û dila, dengbêjên me yê me bibin li Anatoliyê, gund bi gund, bajar bi bajar bigerînin!...

Em bi hatina we pir xenîbûn!

Em ê şênayîyeka xweş bi hev re derbas bikin...

Di nav van deh salan de li dunyayê, di naturê de, di civatê de pir guhertin çêbûn. Guhertineke pir piçûk jî ev bû ku hejmarê kovara Bîrnebûnê ya yekê di sala 1997an de derket. Heta niha 33 hejmar, bi gotineke din nêzî 3000 rûpel, bi navê kurdên Anatoliyê, li ser kurdên Anatoliyê bûn dokument: Dîrok û serpêhatiyên kal û bawên me, wêne û qedera xelkê me, gund û bajar, çîrok, zargotin û yaranî, ziman û adetên me, cil û bergên me, gelek tiştên weke van tiştan di van deha salan de, di rûpelên Bîrnebûnê de hatin

raxistin. Bi piranî bi zimanê kurdî û hinekên wan jî bi tirkî.

Li gel kêmasî, zehmetî û netemamiya hinek tiştên xwe jî em bawer in ku Bîrnebûn ji bo kurdên Anatoliyê bû navgîn û meydana geahiyê.

Kovara Bîrnebûnê ne tenê ji bo kurdên Anatoliyê, herweha ji bo kurdên parçeyên din jî bû çavkaniyek ku ew li ser kurdên Anatoliyê bibin xwedîzanebûneke berfirehtir. Tiştê ku em pê dizanin; bi derketina Bîrnebûnê re, gelek kurdên me yên Anatoliyê dest avêtin qelemê, jiyana xwe, çîrokên xwe, gundên xwe, hîsên xwe bi zar û zimanê xwe nivisandin û xwestin kesayetîya xwe binasin û xurt bikin.

Em îro bi dayîna xelata kurteçîrokan a li ser navê kovara Bîrnebûnê, Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Stockholmê û Komela Ziman li Almanyayê dilşa ne!

Em pê serbilind in û hêvîya me heye ku Bîrnebûnê di deha salên pêş me de vê erk û xebata xwe baştir û tekûztir bike.

Spas ji bo guhdariya we!

Her dilşa û bextewar bin!...

# Kombûna redaksiyona Bîrnebûnê li Stokholmê, 28 ê gulanê, 2007 – protokol –

## Beşdar:

Mecît, Elî, Sefo, Mizefer,  
Vahît, Mile, Cuneyt,  
Fîkret, Ûsiv, Beko, Nuh

**Cîh:** Weşanxaneya Apec

Di sêrî da ji ber ku hevalekî nû  
teve kombûnê bûbû, hevnasînek  
çêbû. Dûra rojevê destpê kir:

1. Di derheqa **bernameya  
şênayîya şewa xatirê dehsaliya  
kovara Bîrnebûnê** da hevalên li Swêd  
(Mecît, Sefo, Elî) haydarî dan: moderatora  
bernameyê, gotarek li ser Bîrnebûnê,  
belavkirina xelatên kurteçêrokên, klam û  
govend, xwarin û vexwarin...

2. Li ser **rewşa Bîrnebûnê** hate den-  
gkirin, rol û rindî û bikêrîyên wê, kêmanî  
û tahlîyên wê yên ji alîyên navorokê,  
kadroyên nivîskaran û belavkirinê da ji  
alîyên beşdaran va hatin ziman. Beşdaran  
merem û mirazên xwe yên ji bo pêşerojê  
jî gotin. Li gorê malumatên ku Mizefer  
dayî, ji alîyê abonetiye da tu peşveçûn  
tunen heta kêmbûn heye. Di gotar û  
mineqêşan da, pêwîstiya zêdekirina abo-  
neyan û belavkar û nivîskaran nû derke-  
te meydanê. Bi vê minesebetê tevlêbûna  
Cûneyt a karê Bîrnebûnê wekî berpir-  
syarê Awistiryayê bi şabûnekê hate qe-  
bûlkirin. Pêşniyara derheqa ku Îrfan bi-  
be berpirsyarê Danîmerqa hate qebûlki-  
rin û Mizefer ê mîzgîna vê xwaşpeyamê  
bigîhîne wî.



3. Pêşniyara Nuh a derbarê **pir-  
sa xelatdayîne** hate mineqêşkirin. Li  
dawîyê pirs weng hate girêdanê ku  
xelat ne tenê ji bo beşekî, bo şexis û  
saziyên ku, bi çî awayî dibe ma bi-  
be, xizmete pêşvaçûna zimên dikin  
bê dayîn û ne salinî be û her du sazî,  
Weqîfa kurdên Anaotolîyê û Komela  
Ziman li ser vê pirsê bifikrin û bigêhin  
encamekê û wê jî bi daxûyanîyekê bi-  
hevra aşkere bikin.

4. Xala dawîyê ya kombûnê a merem  
û dilxwazîyan bû. Li wir pir pirs û  
pêşniyar hatin ziman nimûne: Çêkirina  
konferensan li gund û qesbayên kurdan  
li Anatolîyê bi minesebetan şênayî û  
festîvalên ku havînê tên çêkirin (Fîkret).  
Amadekirina kursên zimanê kurdî bo  
endamên redaksiyona Bîrnebûnê û  
Komeleya Ziman li Elmanyayê (Vahît,  
Ûsiv,...)

Nivîsyanê protokolê: **Nuh Ateş**

## Li ser 10 hejmarên Bîrnebûnê

Nebî Kesen

Deh salên “Bîrnebûn”ê ji bo koverekê demek direj e. Di van salan da 33 hejmar hatin çapkirin û bi sedan nivîs, helbest, çîrok, hêkat û lêkolîn di rûpelên kovarê da derketin. Ji aliyê ziman, dîrok û çanda kurdên Anatolîyê “Bîrnebûn”, roleke yekemîn û giring list. Ev bi xizmet û hewldanên xebatkarên “Bîrnebûn”ê ra girdayîye û dibe sebeba pasantina van kesan. Li ser naverok û qelîteya “Bîrnebûn”ê divê xwendevan û nivîskarên wê jî dîtîn û pêşniyarên xwe bînin ziman. Lê, li hêla pasnakirina û alîkarîya kovarê, ji bo pêşvebirina wê mecbûr e ku kêmasî û rexne bîn ziman.

Lêkolîn û şiroveya hemû hejmarên “Bîrnebûn”ê divê bibe babeta nivîseke din. Li vir tenê deh hejmarên

“Bîrnebûn”ê yên dawî (23-33) hatin berçavkirin. Armanca nivîsê ew e ku kîjan babet di deh hejmaran da bi pirranî cîh girtibûn, bi kurtî bîn tespîtkirin. Ji bona vê yekê, şirovekirina naveroka her babet yan jî nivîsê ne mimkûn bû. Di her hejmarê da gelek babet hene û klasîfikasyona ewan jî pêwîst e ku mirov bibîne ka çî di hejmaran da cîh girtiye. Di tabloya jêri da li gora klasîfikasyona babetan hejmarên nivîs, çîrok, hêkat, helbest, kilam û hwd. hatine dayîn. Gerek ji aliyê klasîfikasyonê gerek jî li ser hejmarên babetan mimkûne ku kêmasî hebin. Rexne û pirsên ku di vî warî da ji niha da werin gotin, ew ê ji bo lêkolînên pêş me yên li ser “Bîrnebûn”ê rolekê bilîhizin.

Hejmar	Nûçe/ Bûyer	Şexis/ Hevpeyvîn	YE	Nivîs/ Civat	Çand/ Hêkat	Dîrok	Çand/ Çîrok	Helbest/ Stran	Lêkolîn/ Tirkî	Ziman	Lêkolîn/ Kurdî
23	5	3	1	1	2	1	1	9	4	1	0
24	7	0	1	1	3	1	1	23	3	1	1
25	1	2	8	1	3	1	1	5	3	1	0
26	7	3	1	0	2	0	4	13	2	1	1
27	4	4	1	3	1	1	1	4	2	2	0
28	5	6	0	3	0	2	1	6	0	2	2
29	3	3	0	2	1	1	0	8	1	1	3
30	3	3	1	3	1	1	2	8	3	2	0
31	1	2	0	3	2	1	1	4	3	0	1
32	2	1	1	3	0	1	0	4	3	1	1
33	2	0	0	2	0	3	5	3	0	1	2



# PÎROZBAYÎYA 10-SALÎYA BÎRNEBÛNÊ



Babetên, ku di her hejmara “Bîrnebûn”ê da hene, ew in: Hevpeyvîn/nivîsên li ser kesan, çîrok, helbest/stran/kilam, dîrok, lêkolînên bi tirkî. Nûçe (xeber) jî bi taybetî tîn nivîsandin, lê bi pirranî li ser bûyerên li Ewropayê ne. Xeberdayîna bûyerên ji gund û bajarên Anatolîya Navîn pir kêr in. Lêkolînên bi tirkî bi pirranî jî alîyê birêz Mehmet Bayrak hatine amadekirin. Li ser Yekîtîya Ewropayê tenê birêz Nuh Ateş û xwedîyê wê nivîsê çend tişt nivîsîn, lê ev ne bes e.

Lêkolînên bi zimanê kurdî him hindik in û him jî ji alîyê lekolînerên ji derveyî Anatolîyê bûne. Yek nimûne ji bo ewan kesan birêz Rohat Alakom e. Va tiştêkî baş e ku “Bîrnebûn” alîkarîya nivîskar û lêkolînerên ji Kurdîstanê dibî-

ne. Pîrsa di vir da ew e ku çima kurdên Anatolîyê lêkolînên xwe bi zimanê kurdî çênakin? Ma, ew xwe di vî warî da zana (yan jî ûzman) nabînin? Divê ev helwest bê guhertin.

Du hejmar bi giranî li ser babetekê bûn. Di hejmara 25an da li ser Yekîtîya Ewropayê û di hejmra 31an da li ser 40 salîya kurdên Anatolîyê li Swêdê gelek nivîs hatin weşandin. Divê salê carekê hejmarek bi pirranî li ser babetekê be ku li gora giringîya wê, nivîs û lêkolîn ji alîyê firehbûn û kûrbûnê pêk bînin.

Çîrok û hêkat gelek hatine nivîsandin. Pirranîya wan ji qelemên birêz Nuh Ateş û Mam Xelikan hatine ser xetê. Ji dorûberên heremên Anatolîyê



Ji çepê: Helîme, Bes, Elî, Dr. Mikailî, Yusuf Polat, Yusuf Yeşiloz û Bahtiyar

yên din jî, çîrok û hêkat divê bên nivîsandin. Ev, berê herkesî wezîfeya mamoste, zimanzan û erbabên wêje (edebîyat) ji Anatolîya Navînê ye.

Babetek ya herê mezin ji kovarek kurd wek „Bîrnebûn“ê pîrsa ziman û perwerdeyê ye. Birêz Alî Çiftçi giraniya xwe di deh hejmaran da daye ser vê babetê. Birêz Nuh Ateş bi nivîs û dîtînen xwe di vî warî da jî li ser zêde kirîye. Li ser ziman û gramera kurdî birêz Amed Tîgrîs û Murad Ciwan jî çend nivîs derxistin. Divê di her hejmarekê da „Dersên Zimanê Kurdî“ hebin.

Nûçe, nivîs û lêkolînên kesên ku li welat dijîn pir hindik in. Li ser rewşa kurdên Anatolîyê (civat, aborî, sîyaset û îdareya hereman) ya îro, li ser jîyana jinan, zarokan û ciwanan bi taybetî nivîs, niqaş û lêkolîn qet tune yan jî pir kêmtir in. Pîrsa tê bîra me ew e ku xwende-

van, akademîsyen û xwedîmeslek yê li Anatolîya Navîn li kû ne? Li Ewropayê bi dehan alman, swêdî û yê din bi zimanê kurdê fêr bûne. Lê, kurdên me hîn jî bi zimanê dayîka xwe nanivîstin. Va rexne ji bo sîyasetmedarên welatparêz jî derbas dibe. Di deh hejmaran da hat dîtîn ku neslê ciwan di xebatê „Bîrnebûn“ê da qet tune, eger çend îstîsna nebin.

Hinek nivîskarên birêz wek Muzaffer Ozgur, Bekir Dari, Vahit Duran, Irfan Baysal, Yusuf Yeşiloz, Mehmet Şahin û yê din jî bi berhemên xwe alîkarîya „Bîrnebûn“ê kirine. Divê kesên ku demekê di kovara „Vege“ da nivîsîn, di dema pêş da alîkarîya „Bîrnebûn“ê bikin. Parastin û pêşvabûyîna ziman û çanda kurdî êdî bûye nîngê tekoşîna netewî. Ne pêwîst e ku hin jî li ver vî niqaş bîn kirin.

# MALBATA ME PÏR MEZÏN BÛ

Muzaffer Özgür



Ê vira tijî be!

Hediye Guzel, Cejno û Muzaffer

Foto: Dr Mikaili

Îro meriv dikane ji bo deh salîya Bîrnebûnê ji her alîyekî da pîrr tiştan bibê û binivisîne. Ji zimanê devokî em hatin merheleya zimanê niviskî. Me di deh salên derbasbûyî da, di vê rîya xwe ya dûr û dirêj da serkeftinek dît. Mumkun e meriv li ber asimîlasyon û xwejbîrkerîne bisekine. Îsbat kovara me ye. Lê redaksiyon û nivîskarên wê, dost û havelên wê nikanin bi tenê bi ser kevin. Lê em dikanin bibin nimûne. Lazim e ku cimata me ya KAN heq û huquqa xwe bizane û ji bo ê jî gavên taybet bavêje. Li ziman û kultura xwe xudan derkeve. Me gotibû; Zimanê me Hebûna me ye. Gerek bi vê armancê em bi ser kevin.

Dema me ji civîn û hevdîtinan şun da dest bi kovarê kir em ne rojnemevan bûn.

Kek Mehmet Bayrak û Nuh Ateş ji bo nivîskariyê bi tecrube bûn. Heryekî me di rojname, kovar, rêxistin û komelan da kar kiribû û tecrubebûn me hebûn. Lê têrî kovareka nivprofesyoneî nedikir. Di hejmara 1ê da me dît ku karûbar pîrr e û em nikanin bi ser kevin. Fedakariyeka pîrr mezin û zanatî gerek bû. Em endamên redaksiyonê ji bo organizekirina Kovarê hazir bûn.

Dema me Kek Ali Çiftçi nas kir roj di dil û mêjîyê me da biriqî û me xwe bi sîng da vî karî. Em heta îro hatin. Lê êş û birînên me jî tim çêdibûn.



Newroza 1997an li Wupertalê.

Ji çepê: Huseyin Kalaycı, Dr. Mikailî, Nuh Ateş, Bekir Darî û Muzaffer Özgür

Organizekirina karûbar, têkiliyên me, belavkirin û aboriya me tim bi fedakarîya insanên me dibû. Kovareka li surguniyê tim êşên xwe dibûn. Lê her tim me êş û kulên xwe derman dikirin û em bi ser diketin. Însan hebûn dema behsa kovara me dikirin, digotin, j çend hejmaran şûn da ê xelas kin û wan însanan ji rêxistin û komelan direvin, ew dixwazin tu kari kurdiyê nekin ew direvin. Lê ziman hebûna me bû, dil û êşên me hebûn em li ser karûbarê xwe sekinîn.

Karûbare kulturî li dervayî welêt, li surguniyê nagêje kokê xwe, zehmetî û kêmasî pirr dibûn. Rîya gêştina koka me tim bi êş û bela bû. Ji deşta Haymanê heta gundên çolê, ji Yunaqê heta Sarizê em belav bûbûn. Lê insanên me li gerineka mezin da em nediditîn. Nedixwastin destê xwe di bin kêrê kin. Name û peyam dihatin lê serxwebû-

na me, astengiyên me jî çêdikirin. Her hejmarekê em bi quwet kirin û hêz da me.

Min bi xwe di bin karûbarê kovarê da nalenal bû, lê ku hejmaran nû ji Swêd digihêste destê min, ez dihêliyam û hêzeka nû dest pê dikir. Jiyanan min a li surgunuyê bi taybe-

tiyên xwe pirr bi zehmet bû. Bîrnebûn bû dermanê kul û êşên min. Bi seetan, bi rojan min li ser kompîturê ku hevalan dayîn min kar dikir. Dîroka Rojnamevanîya-Çapemanîya kurda di serê min da cîh girtibû. Ji rojnameya Kurdistan, Hawar, Ronahiyê bigre heta Bîrnebûn û Vateyê, êş û zehmetî berdewam bûn. Carcaran dema min nivîs hazir dikirin, çavên min bi diloplan şil dibûn û sebra min nedima. Mînak ez î li ser hespekî qir bûm û li deşta Anatoliya Navîn gund bi gund, qeze bi qeze digerîyam. Li wan gerên xwe min kovara me dikire destê xort û keçên me. Li dawet û şahîya diketim govenda. Ez bi rastî pirr kêfxwaş dibûm. Armancên me yên ji bo gelê me bi salan di heş û dilê me da bi aliyeki va di kovara me da di hate nivîsandin.

Her hejmar zêde dibûn, kalîte û navarok jî dewlemend dibû, îtibar û eleqe



pirr dibû. Ji bo wan eleqana me dest bi civîna kir. Li Swêdê, Danimarkayê, Almanyayê, Avustiryayê, Swîsreyê û Tirkiyeyê bi civînan me bi însanên me va hevdu dîtîn. Me xwe da nasîn, wan kesan alîkarî dan me, bûn abone û xwendewanê Bîrnebûnê.

Pêşdaçûna teknikê me bi kar anî û karê me sivik bû. Bi rîya e-postê tekilîyên me xurt bûn. Malpera me agahdarî dan însanan. Neçûyîna kovara me ya Anatoliya Navîn ne mesele bû. Li deşta Cihanbeyliyê însanê bi rîya malperê kovara me dixwînîne. Peyam dihatin nivîsandinê.

Eş û derdê me kêmbûn. Tekilîyên me hîn baştir hatin organizekirin. Nivîskarê me zêde bûn. Aboneyên me ji her aliyê dunyayê ji me ra bûbûn morelek. Me bi tēkilîyên xwe yê berê heval û dostên xwe, tev karûbarê kovarê kirin. Însanên ku gotibûn, em nikanin, bûn abonê me. Bi peran alîkarî dan me. Birêz Hüseyn Kalaycı, endamê redaksiyonê bû, ji bo karûbarê xwe bar kir çû welatê Avustiryayê, lê hevalbendîya me berdewam e û ji endamtiya redaksiyona kovarê bi dile xwe derket. Birêz Bekir Dari ji bo karûbare xwe yê hunerê bi dile xwe endamtiya redaksiyona kovarê berda. Îhsan Tûrkmen bû endamê redaksiyona me.

Li Almanyayê Komela ZİMAN hate demêzirandin bi wan tēkiliyan me



Nuh Atêş û Reşid Karakaya ji civîna Komela Ziman a li Wupperalê-2003

gaveka din avêt û em pêş da çûn. Hemû endamên komelê piştgirî dan kovara me. Biborînin ez nikanim navê wan binivîsim.

Yusuf û Hatice Polat, Ayşegül Kisabacak, Nurten Gencaga-Kaya, Temeli Bayrak, Yusuf Yildiz, Nebi Kesen, İrfan Baysal, Mustafa Mih, Ecevit Yildirim, Mîle Kara, Faik Balci, Kemal Harimci, Necati Sezgin, Cemal Coşkun, Mehmet Özkan, Osman Gundogdu, Sevket Ozcan, Tahsin Demirsoy, Bilal Şimşek, Efe Apaydin kovar belavkirin û tēkilî çêkirin. Ew ê ji bo belavkirina kovara me û karûbarê wê alîkarî bidin me.

Li Swîsreyê; Yusuf Yeşilöz, Mustafa Selimoğlu, Vehbi Ozden, Üsivê Cimik, Hamit Ozden, Omer Çiçek, Behram Alabay, Huseyin Üzumcu. Kemal



Ji civîna redaksiyon û Komela Ziman, Wetzler 2003

Ozgur Li Danemark; İlyas Çamur, Mustafa Badilli, Aydın Durukan, Ersen Ozgur, Osman Aytac, Rebeni Celikan, Yasemin Peker, Ibrahim Yildirim, Ahmet Bayram. Li Fransa; Lutfu Ozsoy, Şevki Ozkan, Abdullah Yurtsever, Li Avustirya; Vahit Pirhan, Bulent Kayacan. Li Hollandayê; Neçirvan Qilori, Meme Hilkeçiki, Roni Yildirim. Li Norwecê; Muhammed Agit, Seyfi Guzel, Hacı Akman, Huseyin Kişniş. Li Tirkiyeyê; Huseyin Kerpic, Mem Xelikan, Levent Kanat, Ali Çetinkaya, Miçe Usê, Ali Gordoqli, kêm û zêde te-ve karûbarê me bûn.

Abone û dostên me ji hene, lê bixarşînîn ez nikanim navê hemûyan binivînim. Dema destpêkê merkeza Komkarê û komelên wê , Civata

Kurd Li Almanya e.V. û komelên wê, Komkar DK., Dansk-Kurdiska Kulturhuset-DK, ji ji bo belavkirine alikari dan me. Carcaran me ji bo agahdariyan bi Yekkomê va daûsand.

Ji bo belavkirinê li Tirkiyeyê bi hinek Pirtûkxanan va, têkiliyên me yên dostanî çêbûn. Pirtûkxaneya Medya li Stenbulê, Pirtûkxaneya Toplum, Akademiya Kitabevi, Cafê Babil, Pirtûkxaneya Çarçira, Dipnot Kitabevi, Garip Plakçilik li Enqereyê, Garip Plak li Haymanayê, Duygu Müzik Dagitim, Medya Kitabevi ve Kirtasiyecilik, Anatoliya Muzik Center li Polatliyê, Gül Kitabevi li Kirşehirê, Taş Kitabevi li Konyayê.

Rojnameyên kurdan; Roj, Özgür Gundem û Dema Nû, Özgür Politika ji bo nasandina Bîrnebûnê agahdari



Şahiya li Wuppertalê 2003, Pico û gruba muzikê

dan kurdan. Bi Taybeti Medya û Roj TV em di bernameyen xwe da dan nasin.

Li Swêdê hevalan Weqfa Kurdên Anatoliyê ava kirin. Bi rastî gavên me zêde bûn. Ali Çiftçi û Seyfi Dogan endamê redaksiyona Bîrnebûnê û Reşit Karakaya, Mahmut Baran, Mecit Çiftçi, Omer Sarihan, Ibrahim Yildirim, Ali Coşar, Mahmut Arikan, Hamit Atmaca, Harun Cosar, Hacı Baysal, Yusuf Güler, Hacı Çelik, Metin Güler. Karûbarê wan hevalna pîrr hêja ye, eger min navên hin hevalan li wir nenivsandîye ma min biborînin. Ez hemû endam û aligîren weqfê nas ji nakim.

Bîrnebûn bû rojek, tesîra xwe bi taybetî li ser KAN yên li Ewropayê pîrr bû. Grubeka Kurdên me yên Anatoliyê

kovara VEGER derxistin. Em bi rastî bi weşana Vegerê pîrr şa bûbûn, lê hevalên hêja heta hejmara 9an devam kirin û ji wê şûn da dev ji weşana kovarê berdand. Gund bi gund komel ava bûn. Bi bingehiya Bîrnebûnê agahdariyên balkêş çêbûn û têkilîyên me zêde bûn. Îro pîrr gunda komel yan ji malperên xwe hene, têkilîya însana bi hev ra heye. Şev û şenahiyan çêdikin ji bo hevdu ji bîr nekin. Ev karên balkêş ne hendik in.

Teng heval hene ku wan bi nivîsên xwe yên balkêş hundirê Bîrnebûnê dewlemend kirin. Curikî (Osman Alabay), Necati Kanoglu, Memo Şahin, Ayşe Yildirim, Avdo Karataş, Evîndar, Rohat Alakom, Ayşe Guler, Yusuf Ozden, Seyitxan Anter, Bayram



Ji çepê: Yusuf Yeşiloz, Eli Çiftçi, Seyfi Dogan, Nuh Atês, Dr. Mikaili, Muzaffer Ozgur, Yusuf Polat û Vahid Duran

Ayaz, Şukru Gulmuş, Ahmet Tigrîs, Murat Civan, Xizan Şilan, Hilmi Yeşiltaş, Omer Faruk Hatipoglu, Altun Başaran. Mahmut Levendi, Hesenê Metê û niviskarên me yên din. Bi dil spasîya xwe dikim. Ma min biborînin ku min hin nav nenivsandine.

Me di kovara Bîrnebûnê da, nivisên gerokên Avrûpî û yên din ku ji bo KAN meqele, pirtûk û bîranîn, dî-

tinên xwe nivîsandine vergerandin û çap kirin. Ji bo dîroka me nimuneyên baş hatin holê.

Mî 10 salên Bîrnebûnê ji aliyên têkilîyan û belavkirinê va nivîsandin. Hûn ji dibinin ku bi têkilîyan, me yekitiya Kurdan ava kiriye. Bêşik û hissên xerab bi hemû kurdan ra me hevalbendî çêkiriye. Ji bo wan kar û barên me ez bextewar im. Le hûn?



Dîmenek ji şahîyê, ji çepê: Ayşe, Rojîn û Evîn bi cil û bergên kurdî

Foto: Dr Mikaili

Destê xwe û milên xwe bidin hev û piştgirîya çapemenîya kurdi bikin. Hûn ê bextewar bin. Zimanê me hebûna me ye, ji bîr mekin. Ji bo ziman jî Bîrnebûn gerek e, Bîrnebûn ma were mala we.

# BÎRNEBÛNÊ ÇI KIR?

Mem Xelîkan

Em çar pênc heval hatin cem hev, li her civînekê, li her derekê an jî di nivîsên xwe yê lêkolînê de, tim û tim qala kêmayîyên edebîyata kurdan ya nivîskî dikin. Ev rastî ya me ye. Lê ev rastîya, ji bo kurdên Anatolîya Navîn hê mezin e. Hetanî pênc deh salên dawîyê, em bêjin edebîyata wan ya nivîskî qet tunebû nabere derew. Deh salan berê, dema kovara Bîrnebûnê dest bi weşandinê kir, him ew kêmayîya ji meydana rakir, him jî ew valahîya hindik be jî tiji kir. Êdî him kovarek kurdên Anatolîya Navîn hebû, him jî kurdên Anatolîya Navîn, dest bi edebîyata nivîskî kiribûn.

## Erê, Bîrnebûnê çi kir?

- Bîrnebûn; li dîroka kurdên Anatolîya Navîn(KAN) gerîya. Qasî bi dest re hatî, ji kêderê hatine? Çima hatine? Çing hatine? Çi zilm û zor dîtine? Sedemên wana çi ne? Ji bo van pirsan, ger ji edebîyata devkî, ger bi lêkolînên zanyarî bersîv da.
- Bîrnebûnê dema KAN bi ci bûn hatin bi cih kirin, dûva kultura xwe çing parastine? Kulturek çing afirandine? Zimanê xwe çing parastine? Ewana kirin belgeyên nivîskî.
- Folklorê KAN kir belgeyên nivîskî. (Çirok, henek, gotinên mezinan, wêje, klamên şînan, stiranên dilan hwd... berhevkirin û weşandin)

• Bîrnebûnê; dest bi weşana xwe kir dûva, li heremê hejmara xwendin û nivîsandinê bi kurdî zêde bû.

• Bîrnebûnê; di weşanên xwe de, cih da gelek şair(helbestvan) û nivîskarên KANê, û ew bi dere meydana xistin. Gelek hunermend jî afirandin. (nivîskar, helbestvan, wênevan hwd.)

• Bîrnebûnê; cih da hevalên bi devî KANê dinivîsinin û bi wê jî xizmeteke mezin ji bo zimên anî şûnê.

• Bi piştgirtina Bîrnebûnê, KAN Komala zimên û weqfa KANê saz kirin.

• Bi alîkarîya hersê sazûmanan (Bîrnebûn, Weqif, Komala Zimên) li dervayî welat civîn û şev çêbûn. Wan şevan xelkê me yî li xerîbîyê anîn cem hev. Ji xelkê me re bûn hevî.

• Hersê sazûmanan; xwedî yê şuxilên ji bo KAN xwedîxelat kirin. Vaya; ji bo motîvekirinê gelek baş bû. Ha! vana bes in? Na, hê gelek pirsgirêkên xelkê me û Bîrnebûnê hene. Daxwaza min: Komala Zimên û Weqif, heryek ji bo berpirsiyarên xwe hê aktîf bibin. Bîrnebûnjî; bi îmkânên xwe û bialîkarîyên van her du sazûmanên me, bi qadroyên profesyonel lîkolînên zanyarî pêk bîne. Ji bo BÎRNEBÛN'ek hê baş, de rabin ser xwe. Ji Bîrnebûnê re, xwendevan û kedkarên wê re emrekî hê dirêj.



## Bîranîna 10–saliya Bînebûnê me li Stockholmê piroz kir



Foto: Anders Rydell

Ji çepê: Ayşe, Altun, Rojîn û Evîn bi cil û bergên kurdî. Altun Başaran kincên jîna yên Anatoliya Navîn dide nasîn.

Nêzî 400 kesî hatibûn. Ev ji dor derê Anatoliya Navîn, ji gundên Enqerê, Qonyayê, Qirşehirê, Qayseriye, Koçhisarê, Balayê û Haymanê bûn. Em bi hev re bûn wekî malbatekê, me hevdu nas kir.

Mivanên me ji Almanyayê, Holandê, Danimerkayê, Norvecê, Avusturyayê, Swîsreyê û ji welêt hatibûn.

Dengbêjên şevê em bi kilamên xwe yên folklorî, jîn û keçên bi kincên kurdî, xort û keçên me bi kişandina govend û dilanên xwe em birin welêt û anîn!..

Hîsek wusa çêbû ku bi gotinan nê zimên... herkes xenî û dilşa bû. Mîna dawetakê bû.

Bîrnebûnê ji 1997 an vir de hetanî niha 33 hejmar derxistine. Ev ne tiştekî hêsa ne, bi zimên qola ye...

Mala malbata Bîrnebûnê ava be ku heta niha xizmetekî baş ji bo kultur û zimanê me kir. Bi vî karî xwe hem folklor û zimanê me yê ku li ber wendabûyîne bû, da nasandin û hem jî parast.

Rojekê ez bi niviskarê hêja kek Rohat Alakom ve çûm APECê, li wir min kovara me Bîrnebûn dît.

Li mal du heb hebûn; nimra yekê û sisêyan. Ji bo ki min nedikanî bi kurdî bixwînim û binivisînim, min pir meyla xwe nedabûyê.

Ez vê wekê kêmasi dibînim, çima ez



Dimenek ji şahiyê

Foto: Dr Mikail

nikanim bi zimanen xwe binivîsînim û bixwînim?

Min xwe wekî handikap didît. Ku meriv li zimanê xwe xwedî derneket, ez vê wekî kêmasiyekê dibînim.

Îro di saya Bîrnebûnê da min xwe fêrî xwendin û nivisandina bi kurdî kir. Eger meriya xwest tiştekî ne bi zehmet e. Berî her tiştî xwestin muhîm e.

Hevalên hêja, nas, dost û gundiyan bi qedir, li şevê tiştekî bala min kişand, her tişkî me baş bû lê, le wir me kovara Bîrnebûnê û kitêbên bi zimanê me kiribûn rêzê. Qe tu kesî li mêze jî nekir. Ez bi xwe pir xemgînî bûm! Çima em ji xwendinê hez nakinî!...

**Altun Başaran**



Foto: Anders Rydell

Ayşe û Altun bi cil û bergên kurdi

## Bîrnebûn

Ji dur ve, li ser rê kovarek dibirîqî...



Foto: Dr Mikailî

Bayekî germ, ki ji hêla Anotolî ve difire, rûpelên kovare yek bi yek bi serhevdi re davit. Li nêzikî sekinîm, heta ku sîya min bigihije ser kovare... Min xwe xar kir û kovar xist a paşila xwe...

Ji pêş va dura dur bi giraniya xwe bajarek li ber min mezin dibû. Nêzik bûm. Ketim nav...

Li ber bajêr, kak Nuh, bi simbêlên wek Nietzsche derket hember min. Got; „Lawo, tu kuda terî? Te rêya xwe vindakirî, an tu li belaya xwe digerî?...” Kenîm... Xwe cerx kir û çû.

Nizanim çima, ez jî ketim dû...

Bajar, bajarekî ji bajarên bakurê cîhanê û sar e. Têda malbat hene.

Hinek, Xelîkan in, hinek Cêlikî, hinek Şêxbizin in, hinek Bilikî, hinek jî Canbegî û Reşî ne... Lê bi her awayî, Mîrovên ji Anotolîyê ne, bi gotinaka din, kurdên ji Anatolîyê ne...

Di wî bajarî da, ez bawerim pîrr rengên ji mîrovaatîyê hene. Ji her gelên cîhanê mîrov hene. Ji her gelî peyv hene. Kurd û peyvên kurdan jî hene.

Lê ez îda dikim ku li vî bajarî, tu henekên wek henekên kurmancê me ên ji Anotolîyê jî hîn nehatina gotin...

Hîn tu henek wek henekên wê şevê li ser bajêr negerîn... Li ser eşîran, li ser nalbatan gotinên heta îro min qe nebihîstî, an jî, bi zimanekî min dengê wî ji zu va vindakirî, giran giran mîna



Foto: Dr Mikailî



Foto: Dr Mikaili

Dimenek ji şahiyê, sergovend: Mistefa Mix.

ava di bin zevîyan de dixuşe gihîştin min. Dev bi ken bûn. Jîr û zana bûn.

Kak Reşît, digot; „Neçîrvanekî li kerguyek xistê, tabî wextik girtê, di nav qîrs û mirsan da guhê kergu qelîsî... Vedigerê gund. Li ser rê rastî yekî din ji gundê xwe hatê, ji malbatake din bê. Neçîrvan, kerguyê xwe pê mêrandê... I din gotê; „ Lilo tu newînî, durê vê durê Molê Usî Hayde, di kêlekê da qelîsê... Bide ez wî bidim wan“ û kergû ji dest neçîrvan girtê.“

Diwê da, ken û „xusumeta“ di nav Malwatan de dest pê dike... Kî ji kîjan balbatê? Neçîrvan ji kîjanê, gundî ji kîjanê?... Hahoy... Edî kes nikare, devî turukê henekan bigre... û ma girtin li hêlekê bisekine, her yek turukekî din vedike...

Mîn ji wan çend rojan, bîhna gundê xwe, bîhna şîrê di helkê da kîsand cîgerên xwe. Dizanim, hevalên bi salenekî giraniya xwe, keda xwe dana ser kovarê, di bin simbilên xwe yî spî ve bi min dikenin. Lê nizanim, min tama ku ji zu ve min bîr kirî xista berîya xwe.

Şeva Bîrnebûnê şevak ji şevan bu... Kêm bû, zêde bû. Ne pewîst e ew ewqes bikeve ber çavan... Li wê tiştekî tene xuya dikir, keda deh salan, mîna zarokekî digertî di nav mîhvanan de...

Naxwazim, pirr dirêj bikim... Ji Çar rojan şun ve, min dît ku, Bîrnebûn hîn jî Bîrnebûbû...

Şevak ji şevan bû, şevak wek her şevê bû... Lê navê şevê pîrozbahîya deh salîya Bîrnebûnê bû...

**Cüneyt Dağdalan**

# BÎRNEBÛN BENDEKE LÎ BER BÎRBÛNÊ YE!

Nuh Ateş

Bîrnebûn, Kovara yekem e di tarîxa kurdên Anatolîyê da. Ew Zivistana sala 1997an li Wetzlar, bajarêkî Elmanyê hate dunyê. **Bi hatina Bîrnebûnê, ji bo kurdên Anatolîyê dewrûdemeke nû destpê kir.** Komeke piçûk ji kurdên Anatolîyê xwastin ku tarîx û kultura xwe binivîsin, arşîv bikin. Meri dikana bibê, bi Bîrnebûne kurdên Anatolîyê ji kultura devkî derbasî kultura niviskî bûn.

**Bîrnebûn bendeke li ber bîrbûnê ye.** Bîrbûna zimên, bîrbûn û wendabûna berhemên zimanê kurdî ji bo kurdên Anatolîyê tofaneke mezin e. Bîrnebûn li hember vê tofanê bendeke piçûk lê qeym û giranbuha ye. Ew nişana liberxwedana kulturî ya kurdên Anatolîyê ye.

**Bîrnebûn kana zanîne ye.** Ji bo hayadarîyên derheqa tarîx, kultur û jîyana kurdên Anatolîyê, bi taybetî jî yên Enqerê, Qonîyê, Qirşehîrê û Akserayê Bîrnebûn ji niha da, kana zanîne ye, ansîklopediyek e. Lê pirê zanîyarîyê ku derheqê kurdên Anatolîyê da di Bîrnebûnê de hatine komkirin bi ser ra ne, hewceyî ferehkirin û kurkirinê ne. Huner, ziman û edebîyat bê dawî ne, karê di vî warî da, bi berhevkirina çend çîrok û kilaman bi dawî nabe.

**Bîrnebûn di lêgerîna kurdên Anato-**

lîyê li kok û nasnameya xwe û li şopa koçkirina mezin û pêşîyên xwe ya berve deşt û dûzên Anatolîyê da çîrok e. Ew di prosesa xwe organîzekirina kurdên Anatolîyê û di çêkirina dezgeh û sazîyên wana ên kulturî û civatî da roleke bi tîn dilîze.

**Bîrnebûn ji kurdên Anatolîyê ra nênik e.** Kurdên Anatolîyê xwe, navûnîşanên xwe, tarîx û folklorê xwe, ziman û kultura xwe di bîrnebûnê da dibînin û pê şa û sermest dibin. Bîrnebûn li nav Kurdên Anatolîyê binyatê kesetîya kulturî qeym dike.

**Bîrnebûn me bi hev girêdide.** Di saye Bîrnebûnê da, kurdên Anatolîyê tîn ba hev, hevdu nas dikin û bi hev ra kar dikin. Ji vê hêlê da, Bîrnebûn rola organîsatorekî û komunîkatorekî dilîze. Nimûne, ev şenayîya sewa pîrozkirina dehsalîya Bîrnebûnê li Stokholmê bê Bîrnebûnê mumkun ne dibû.

**Bîrnebûn mektewek e.** Xwendevana bîrnebûnê (endamê redaksiyonê jî tevê) di saye wê da, xwandina kurmanciyê dihêvîsin, hen jî nivîsandina kurdî hîn dibin. Bîrnebûn ji henan ra jî mektewe çand û hûnerê ye.

**Bîrnebûn hevlekî bi kêr e.** Ji min ra Bîrnebûnê mîna hevlekî ye. Ew



tim di min dikûte, ji min nivîsa dixwaze, min teşwîqî û mecburî nivîsandina kurmançiyê dike. Di saya wê da, pir tiştan hêvîsîm, min nivîsandina xwe ya kurmançî bi pêş da bir. Ji ber vê jî, ez wê malava dikim û dibêm, her hebe Bîrnebûn.

**Dehe sal in bendewarê Bîrnebûnê me.** We nizamim, lê ez hîn ji Bîrnebûnê têr ne bûma û benda her hejmareke wê bi hevas û meraq dipêm. Kîngê ku hejmara nûderketî digêhe destê min, nivîsên tê da giştka, henan jî ducar û sêcar dixwînim.

**Dergehê Bîrnebûnê vekirî ye.** Ji sêri da heta îro, civînê Bîrnebûnê vekirî ne. Xelk, kesê ne endamê redaksiyonê jî tevî kombûnê redaksiyone dibin, dîtin û pêşniyarê xwe tînin ziman. Zimanê civînan kurdî ye, protokol, rojev gişt bi kurdî ne.

**Bîrnebûnê kêmanî û tahlîyên xwe jî hene.** Nivîskar û xwendevanên wê hendik in. Kar û barê wê bi amatorî û fedekarîya hezkarên wê tê meşandin û hinek heval têda zêde diwestin. Hejmara jin, keç û xortên ku têda dinivîsin kêm e. Dilê merîya naxwaze ku bibê, heyf e ku piraniya ronakbîr û xwandayên kurdên Anatolîyê qedr û qimeteke ku Bîrnebûn rewayî wê ye, nadine Bîrnebûnê.



Foto: Dr. Mikailî

Dîmenek ji şahiyê, sergovend: Nuh Ateş

**Heta niha, projeya herî mezin û pîroz ya ku weqfa kurdên Anatolîyê li Swêd û komeleya Ziman li Elmanyê dane ber xwe Bîrnebûn e.** Ji niha şûnda jî projeya pêşî ya ku ew alikariya mezin bidinê bi fikra min disa Bîrnebûn e.

**Di şerê mezin yê hebûn û tûnebûnê me da, li coxrafya Anatolîyê, li nav kurdên Anatolîyê egîtekî bi şan û şohret heye. Navê wî Bîrnebûn e.**

Em van rojana dehsalîya xwedê-dayîna vî egîtî pîroz dikin û şabûna xwe aşkere dikin.

Omdî û mirazê me ew e ku kurdên Anatolîyê û xwendevanên Bîrnebûnê vî egîtî tene nehêlîn, alkarîya xwe jê nehêvşînin!

Dehsalîya Bîrnebûnê pîroz be, em-rê wê dirêj be, heval û bendewarên wê xwaş bin!

Mainz, 18.04.2007

# Xas bi me!

Îhsan Türkmen

Gava em xort bûn, hê heşê me nû digihîşt, ew xebera, ew mîzgîniya ku gihîştê mîna îro tê bîra min: „Îç Anadolu Kürtleri“. Pirtûka Nûh Ateş ku li sala 1992ya çap kir... Mîzgîn ew bû ku, pirtûka ku me navê wê bi-hîstî, bi destê nasekî ku li Almanyayê dijî, ketibû destê hevalê me. Sal 1995. Coşeke mezin û bi dizkî bû ji bo me. Me gazî çend hevalên xwe yên pêşepêş kir û me biryar da ku em ê dawiya hefte kom bibin û pirtûkê bixwînin.

Dawiya hefte ewqas jî zû nehat. „Nûh Ateş, Îç Anadolu Kürtleri, (Konya – Ankara – Kırşehir)... Li ser berga hêşîn weng hatibû nivîsandin. Kî ji me zîz bû, kî ji me kelegirî. „Aha va ye îspat ku em jî hene“. Paşê hevalê me yê ku xwediyê pirtûkê, dest pê kir ji me re xwend. Di destpêke de qala çiya û baniya, aborî û qala heyam dikir.

Lê pir najot dev ji xwendina ji dorê de berda û beşa li ser gundê xwe ji me re xwend. A rast ew bû ku her yekî ji me bi piranî ew meraq dikir. Ka li ser gundê me çi hatiye nivîsîn. Min Xelika, yê din Încov û Omera... Me hemû bi dorê beşê li ser gundê xwe û xwendin.

Paşê me biryar da û me got „Gere em pirtûkê kopî bikin û li hemû heval û nasên xwe yên welatparêz belav bikin. Dengê me nere Kekê Nûh, lê me li dukana hevalekî a kirtasiyê 20 heb kopî çêkir û bi qasî ku mesrefê xwe xilas ke jî bi pere firot. Dibe ku me li Tirkîyê pêşî li pirtûkên korsan vekiribe. Li me bibore Kekê Nûh!

Wekî avê û nê nê ev ji pêdiviyek e neyê bicîhkirin bû. Nasname, dîrok û pêşeroj... Nayê bîra min ku kesekî ji aliyê me çend peyvên bi bingeş li ser vê babetê bigota. Adiyaman û Kahta, birayê Ûsiv, Omer, Celal û Xelîl... Ewqas! Pirtûk jî tam bi ser da hatibû.

Bihara 1997. Hacî Erdogan ku yê dest bi vî karî kiriye, ji bo derxistina kovarê hatibû Stenbolê. Ji ber ku ez li wir di nav karê çapê da bûm, me zû hevdu dît. Behsa wî a kovarê têsîra pirtûka „Îç Anadolu Kürtleri“ li ser min kir. Paşê ji bo lêkolîneke li cîh em tevhev çûn Ankara û Konyayê. Hacî ji çend kurdên pêşepêş ê deverê ra qala kovarê yan jî projê kir. Hinekan devê xwe xwar kirin, hinek jî pê şa bûn. Ji wê gerê bi şun va jî min û Hacî hevdu nedît. Min tişt bi dest nexistibû, lê



Dîmenek ji şahiyê, ji çepê: Rojên, Ayşe, Evîn û Altun

Hacî, „erê“.

Çend mehan ji Hacî bi şun va ez jî hatime Almanayê. Pîroz be! Kovar derketi bû. Wekî ku Cahît di nama xwe a xwendevanan de nivîsî bû: „Xas bi me“!

Sal 2007 bi vê hejmara di destê we da ve 34 hejmar „Kurd û Kurdên Anatoliya navîn. Nêzikî 3 hezar rûpel lêkolîn, nivîs, kilam, henek , serpêhatî û hwd...“

Ne hewce ye ku ez dûr û dirêj binivîsim. Hertişt li ber çava ye.

Ez spasdarê wana me. Xwadê ji wan razî be...

Bi taybetî ji Hacî Erdogan, ji bo vê fikrê, Mizeffer Ozgur, ji bo karê logîstîk û nivîsên danasîna gundan -yek cara bike mizemiz jî-, Nûh Ateş, ji bo nivîs, hekat, lêkolînan, Alî Çiftçi, ji bo karê layout, çap û gernaman, Mem Xalîkan, ji bo kilam, metelok û helbestan , Dr. Mîkaîli, ji bo pêşniyar nivîs û lêkolînan, Sêfoye Asê, ji bo helbestan... Û hemû yê din ku piştgirî bi nivîs, kilam, stran, henek, lekolînen û hwd... xwe va bûn alîkarên Bîrnebûnê.

Hûn her bijîn, Bîrnebûn jî bi we ra.

Bîrnebûn di hemêza gelî xwe da

## Bîrnebûn di hemêza „Kurdên Anatoliya Navîn“ da

Îrfan Baysal

Bîrnebûn deh sal in derdikeve. Armanca derketina Bîrnebûnê ew e ku çanda kurdên Anatoliya Navîn binivîsine. Li ser dîroka wan li ser zimanî wan lêkolînê çêke.

Derbasbûna wan û vê dema wan ji hatina wan were nivisandin. Armanca xwe ew bû. Çend kesan bi keda xwe hînan meydanê. Ez hejmara civînan nizanîm çend in. Li çend deran geştinî hevdu. Ne li bajarên welatekî tenê. Elmanya, Danîmark, Swêd û Tirkîye. Hûn texmîn bikin çi qas zahmetî hatiye kişandin.

Ne tenê derketina xwe û dombûna xwe bi zahmet bû. Herweha parastina xwe jî wuqas bi zehmet bû. Li pêşiyê hen kes û komal li Bîrnebûnê bûn xudan. Difrotin û parên xwe jî didan. Kingê dîtî ku nanikê xwe têda tune dev jê berdan. Çimkî xwastin heynan bin siyasetê xwe kin. Ne firotin ne standin ne jî deyne xwe dan.

Lê me Bîrnebûn parast. Nexist bin tu partîyan. Me ji xwe ra kiribû şîr ku kovareka çandî ye û azad e.

Di civînan da jî pirsgrêk derdiketin. Li ser pirsgrêka xebatê û li ser aborî asteng derdiketin.

Ez naxwazim li ser navan bisekinim.

Ez dixwazim hûn bi hen tiştan bizanin. Hen kesan digotin ji bo gelî me kovar exort bikin û hen tiştî din jî çêkin. Çi çêknî? Komalekê çêkinî, Waqfêkê vekinî, rojnamekê derxinî, radyokê vekinî. Va pêşniyarna gerek li Ewropa gerek li welat. Hen kesan di ber xwe da him diketinê „partiyekê jî vekinî“. Çimkî ji bo wan kesan tiştên ki em dixwazin hene. Ne hewcî ye van vebîyan jî çêbin. Ma vana kovara xwe tune. Ne hewcî ye ku em kovare jî derxinî.

Pişt we çir bû. Li gora min Bîrnebûnê çêlik da. Li Elmanya komela ziman vebû. Li Swêdê Weqfa Kurdên Anatoliya Navîn ava kirin. Li Tirkîyê bi zaravê me bûlûrên me heynan bin qayde û CD derket.

Xaskê em dewlemend bûna û me ji gelî xwe ra radio û televizyon vekira.

Tesîra Bîrnebûnê li ser gelî me pir pozîtîf bû. Berî her tiştî ev tesîr li ser nasnamê bû. Ev ji „Kurdên Anatoliya Navîn“ ra pir pewîst e. Bala we bikşînim. Va nasnama me giştka hemêz dike. Di piratîkê de va tesîra pir vekirîye. Di vê demê dawî da komele ku ava dibin malparên ku vetibin bi tundî li nasname xwe xudan derketine.



Dîmenek ji şahîya 10-salîya Bîrnebûbê

Foto: Dr Mikailî

Daxwaza me ev bû Bîrnebûn di çarçeva xwe ya azad û bi serî xwe be. Me ji vê prensibî tavîz neda û em nadin jî. Ji bo vê ye jî ev sê sal in ku dom dike. Li ser deh hezar rupel nivis çêbûne. Giştik jî li ser çanda gelî me ye.

Bîrnebûn ne bi tenê di nav rûpelên xwe da kurdîtîyê dike. Bîrnebûn di nav kurdên Anatoliya Navîn da jî serî da he-ta, bin linge di nav jiyânê da kurdîtîyê dike.

Merik here li suneta la-wikên xwe bi kurdî mewludê bi xwandin bide. Hûn dibên çi?

Li alî din jî nîv xwan-dalên me

bûne gene. Tim ji milletî xwe heytanin, lê tu caran jî tiştêkî jî nadin. Bîrnebûnê ne distînin ne jî dixwînin. Ne xem e. Li gora wan jî Bîrnebûn azad e. Lê ew jî dizanin ruhê wan ne azad e. Li ber Bîrnebûnê serî xwe dikin ber xwe û rûyê wan sor dibe. Ji bo ku ew bêruh in.

Bîrnebûn rastiya gelî me ye. Neynêka gelî me ye. Bîrnebûn dîroka „Kurdên Anatoliya Navîn e“. Bîrnebûn di hemêza „Kurdên Anatoliya Navîn“ da ye.



Dîmenek govendê ji şahîya 10-salîya Bîrnebûbê

Foto: Dr Mikailî



## Çîroka min a Birnebûnê;

# ji ber devî gur

*Dr Fikret Yildiz Mikaili*

Di meha Nîsanê da ji boyî 10 saliya kovara Bîrnebûnê li Îsveçê (Swêdê) şênayîyek çêbû wû. Heval û dosta em bi mîvandarîyeke giranbuha, di malên xu da kirin mîvan. Ew jî perçeki mezin a bingeha erf, edet û rûsimên me ye, kultura me ye. Ewna 3000 km ji gund û bajarên xu dûr jî bin, 40–50 sal in ji welêt derketî bin jî, edetên xu yê kevin û baş nekuştine. Hîn li pê ne. Hîn zindî ne. Zimanê me yî dewletî û şîrîn jî, li wir hîn di nav heyatê da ye, dijî. Li wir tiştikî pirr bi kêfxweş hat serî min, ez dixwazim ji we ra qal kim:

Di şeva 10 saliyê da ji bo destuştinê, çûwûm kefenîgê (WC), li wir lawikîkî 6-7 salî jî ket hundir, xwest di tuvaletê keve. Piştî deriyê tuvaletê hot kir, da zorê, le ku ew venewû, çerxi min bû, bi devokî reşîya ji min ra got;

Ewî meşgul e?

Ew çend sale ku li xerîwîyê, li gundên me û li bajarên, merî ji devî zarîyê me hêndî kurmancî nabîze, yan jî tiştêkî pirr kê m e. Ew ji bo min dilêşekî pirr gir e.

Ez bixwe tim bi zaroyê xwe ra kurmancî deng dikim, le ji min bêtir,

tu kesek jî bi wan ra bi zimanî me yî qedîm, zimanî kala û bavan deng nake. Ewna min baş fehm dikin, berda terin, lê nikarin bersiva min bidin.

Vî lawî 6-7 salî li Îsveçê, bi wê pirsaxu, girî kirin çavî min û di hêla din da jî umîda min, hêvîya min, bawerîya min bi quwet kir, xurt kir. Ez pirr şa bûm.

Bi rîya Bîrnebûnê ji, bawerîya kurdên anatoliya navîn bi xu xu va hat. Wana dîtî ku kilam, çîrok, tarix û kultura wana hêndî li ser xetê (kaxiz) tê nivîsandin. Ew ne wekî ku dewleta hov diwêje, zimanekî paştamayî û biçûk e. Hetta ne ziman e jî!

Berî 10 sala me bi komekî biçûk, amatorî dest bi vî karî kir, lê mêyweyê me, qasî karî aqademîyekê ye. 3000 rûpel tîji nivîs. Giştik jî li ser kurdên Anatoliyê, bi piranî jî li ser Kurdên Enqere, Qonya, Qirşehîr û Aksarayê ye!

Ji me pirr kes hêndî îro bi kurmancî zehf xweş dinivîsin û deng dikin.

Bîrnebûn ji bo min çito derket, çîroka wê ji bo min çiwû, ez dixwazim hîssiyata xu bi we va parvekim.

Sal 1996 bû, rokê min di rojnemeya Özgür Polîtîkayê da îlanek dît.

Îlanek ku di dilî min da bû sebeba ba û boranekê. Ez pê zehf şa bûm.

Ji Qirşehîrê Kek H. Erdogan ew îlan dabû rojnamê û tê da hatiwû nivisandin ku kovara Kurdên Anatoliya Navîn derdikeve û çend niviskarên wek; Nuh Ateş, Mehmet Bayrak, Hatice Yaşar û Ibrahim Güçlü jî di wê da dinîvîsîn.

Ji ber ku me bi Kek Nuh va hevûdu nasdikir û bi Nuh û çend hevalên wekî Bekir Dari, Hüseyin Kişniş, Necati Sezgin (Meçoyî Darê) û Muzaffer Özgür va qasî du sal berê, li bajarî Kölna Elmanyê civînek, seminerê jî bo derketina weşanekê çêkirî wû, min ji wî ra telefon kir û jê pirsî, ka ew, Bîrnebûn, çîye çî nîne? yê çito derkeve?

Min dît ku wî jî wekî min ji boyî vî karî gan kirine! (xwe êşandine)

Dûra, min ji kek Erdogan ra telefon kir, î ku min berê qe nas nedikir, me bi rîya telefonê hevûdu nas kir û min peşniyaz kir ku em bi kesên ku elaqadarin va, li bajarî Duisburgê bicivin û dûr û dirêj li ser projeya Bîrnebûnê bisekinin û guftûgo bikin. Wî ew peşniyaza min, teklîfa min ji dil qebl kir. Li ser vê me îlanek amade kir, kesên ku dildare van tiştan e xeberdar kir û di payîza 1996an da li Cafê Museum a Duisburgê, cara yekê hatin cem hevudu. Ew hîssek pîrr balkêş bû, xweş bû, em di çoxek bê hempa da wûn. Meriya didît ku herkes jî bo çêbûna vî karî ye.

Piranîya me, hevûdu hîn cara yekê dîtîwû, lê kesekî ji derva da bidîya, wî ê bigota qey em dost û hevalên pîrr kevn in.

Wana giştik îro dost û hevalên min yê jîyanê ne, Ew jî ji bo xizmeta vê fikrê hatiwûn wir. Li dû daweya netewî dimeşîyan.

Qasî ku tîn bîra min, ew ev bûn; Hacı Erdogan, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Mehmet Bayrak, Hüseyin Kalaycı, Vahit Duran û birayî wi Mahmut Cahit Duran, Nurşen Kaya, Bekir Dari, ez û Xanima min Şenê.

Di vê civînê da em li ser derketina kovarê sekinin; ka çî nivîs, materyal di destî me da heye? Navî kovarê ê bibe çî? (Kek Heci di îlanê da nave Bîrnebûn lêkirî bû. Dûra jî ew nava hat qebl kirin). Kîye binîvîse? û berî hertiştî jî ka eme wê bi kîjan pereyî derxwînin li ku derxînin?

Ji xencî Mehmet Bayrak em giştik di vî karî da tenê xwendevan bûn. Ji me Nuh çîçikî nivîskar bû. Kesên ji xencî van herduyana, me tenê dixwast ew tişt a bibe.

Lê çito? Me bi wê nedizanî.

Lê iro pîrr kes ji me bûn nivîskar, him ji nivîskare zimani kurdi!

Birêz Hecî nivîsên ku di destî wî da bûne, şandîbûn Stenbolê, du hevalan jî ew ji wî ra tîpkiribûn (Kesekî ji wan me dû ra nas kir, heval û dostê me yî jîr Îhsan Turkmen bû, ya din jî keçek

bû, le navê wê delalê niha di bira min da nema ye, lê keçek gellek baş bû. Xwadê jê razî be!).

Me li dû vê civînê hîn çend civînên din li Duisburg û Wetzlarê, li bajarî kek Vahit Duran çêkirin. Ji ber ku kovar li Tirkîyê derneket, me biryar da ku em herin wan nivîsarana ji Stenbolê hilgirin, bînin Ewropa û li vir Kovarê derxînin.

Ez çûm Stenbolê. Li taxa Taksimê, di Elhamra Pasajiyê da komelek kurdan hewû. Li wir min ew keça kurd dît û wê ew nivîsarên ku di destî wê da wûn, dane min. Ewana qasî ku tê bîra min, nivîsarên kek Îbrahim Güçlü, Hatice Yaşar û ya Heci Erdogan bûn. Le qîmî derketina kovarekê nedikirin. Hewce bû ku em jî tiştan tevê bikin û hîn li nivîskarên din jî bigerin.

Ji boyî vê ez çûm Polatliyê, cem Osman Alabayî rehmêtî, yanê birêz Curukî.

Ji bo min projeyeke wekî Bîrnebûnê bêyî wî nediwû. Ji ber ku hîn di telebetîya me da wî tim ji me ra qala girîngîya dijîlderketina tirkbûnê û asimilasyona dikir, meriye çito xu ji ber vê biparêze, çi bikî. Sohbetên wî gellek xweş bûn.

Ji bo min, eger meri qala bavî fikra kurdperwerîya li Anatoliya Navîn bike, ew jî birêz Osman Alabay e!

Ez çûm mala wî, wî bi dilekî xweş,

ez xerati kirim. Min ji wî ra qala derketina, haziriya Bîrnebûnê kir. Ew bi vê pîrr şa bû. Bawerîya wî bi min hebû, lê wî di heyeta (Jîyana) xu da pîrr tiştên xeraw jî dîtîbû, dixwast gavek şaş navê-je! Min dizanî ku ew kilam, çîrok û destanên me berhev dike, him jî bi xu şîr û çîrokan dinîvise.

Boyî vê min ji wî, ew xwestin. Wî nedixwest dilî min bişkênî, lê ji ber ku berê pîrr kesan ji wî berhemên wi hilgirtiwûn û cardin ji wana tu xeber derneketîwû, wî bawerîya xu kêmbûwû.

Wî çar defterên bi destan nivîsî helbest, çîrok, destan û kilamê xu hewûn, gîşt rayê min dan. Ji wan yek da min. Min ew bir, li cem kitêbxaneyakî islamciya li Polatli yê kopya kir û orîjî-nala wan, dîsa da Curukîyî rehmêtî.

Herçik min wana dixwandin, ez difiryam ezmanan. Ew ji bo min û bo me wek xezîneyekê bûn.

Me ji wan pîrr tişt di hêjmara yekê û yên din da çap kirin.

Li dû derketina Bîrnebûnê, kînga ez diçûm Polatliyê, min hejmarek Bîrnebûnê a hîn nû bi destî xu ji wî ra dibir. Ew bi vê pîrr şa diwû, mest diwû.

Min bi xu kurdî nivîsandin, him nû hu dikir, hîn diwûm, him jî dinîvîsand. Ji ber mecburiyetê min ji xu ra û boyî tîpkirina nivîsarên Bîrnebûnê komputerê kirî.



Dîmenek ji şahîya 10-saliya Bîrnebûbê

Foto: Dr Mikailî

Ji me pîrr kes, yan bê komputer bûn, yan jî nedizanîn bi kar bînin. Me çend kesan; Muzaffer Özgür, Vahit Duran, Cahit Duran ez bi xanima xu Şenê va, ew nivîsên ku dihatin him li mal tîp dikirin, him jî serrast dikirin.

Lê ku ez nika çerx diwîm dîsa wan dixwînim, diwînim ku em di vê alî da çi qas nezan û ecemî bûne. Me ew kar bi kêyfeke dikir, destî me tu qet nediwestîya. Heyecana me, em bi pêş va dibirin.

Dîsa îro ku ez diwînim, kesên ji me xorttir, wek Mila, wek Rîşwan Haco jî bi vî karî girtine î bi avakî gellek zanitî dikin, pîrr kêyfa min pê tê.

Logoya Bîrnebûnî li Wetzlarê nasêkî kek Vahit çêkir û dîsa hêjmara yekê li wir, bi hemî kêmasiyên xu hat çap kirin. Ku ew şaş neyê bîra min me

1500 heb çap kirin.

Ez nika bifikirim. Ya ku me kirîbû, camêriya nezanan bû, lê bi hemd û bi bawerî bû. Pereyê wê jî, me ji nav xu berhev kir. Ew hêjmara yeka, weqas zu belav bû ku, nika da destî me qet nemaye. Him li Tirkîyê, him jî li Ewropayê ji yekva hat firotin. Di civîn û şevên kurdan da, meriya dikarî bigota, kovara ku herî zêde dihat firotin, Bîrnebûn bû.

Ji her fikrî kurdan elaqayek mezin rayê didan. Hîn kes û organizasyon jî di wê fikrî dawûn ku kovar ê çend hêjmara derkeve û dû ra biseke, raweste.

Lê Xwadê ji me ra, ji bakura dinyê, ji Îsweçê Eli Çiftçi şand.

Ew wekî hijdîyarekî, wek xizir gîhîşt hewara me. Wî jî ew tişt bihîstî wû û bo yî wê ji min ra telefon kirîwû. Min

ew hema dawetî civîna me ya hêjmara duduyan li Wetzlarê kir, li Komela kek Vahit, li Mozaikê.

Bi hatina wî qedera ma hat guher-tin û ez dikarim biwêjim ku bêyî wî, me nedikarî Bîrnebûnê heta îro derx-ista. Ew xadiye APECê bû. Lê min ne APEC nas dikir, ne jî jêhatîbûna kek Elî û hîn gellek dost û hevalên wî yî li Îsweçê. Li wir me biryar da ku ew kovar li Îsweçê derkeve, li çapxa-na APECê çap be. Me jî wê şûn va nivîsên kovarê dîsa piranî li Ewropa berhevkin, tîp kirin û ji kek Eli ra şandin, wî jî ew redakte kirin û çap ki-rin. Ez bi xu hîn jî wekîna me, bi hey-ecanek mezin, li benda hêjmara nû me. Me bi malbata xu va bi bavulan kovar birin Polatliyê, Enqerê û Stenbolê. Lê dûra kekî Muzaffer î ku ji me gîştika bikêr û jêhatîtir bû, ew bara ji piştta me hilgirt û heta îro jî ew dimeşîne.

Di van deh salan da em pîrr caran hatin cem hev, min gellek kurdên ca-mer nas kirin. Ew deh salana meri di-kari biwêje, maneya heyata min e. Tirs a min a herî mezin ew bû ku bi te-vayî em li van çolên Anatoliya Navîn da wenda bin, ziman û kultura kal û bavên me ji holê rawe û bimire.

Lê ez dikarim bi serbilindiyeke me-zin biwêjim ku, me gîştika tevîhev pîrr baş li ber xwe da û ew purt ji devî gur xelas kir.

Ew gîştik da ser xetan(kaxiz), nivî-sand, kir film û kir CD. Nika bi dehan, bi sedan gundên Anatoliya Navîn bi xu malperên Înternetê çêdikin, agahî û in-formasyonên xu jî ji kovara me, ji bîrne-bûnê hildigirin. Ew bûye çavika kultura me ya bingehîn. Ji vê şûn va ew ziman bimire jî, nikari bê înkarkirin.

Ji bo min nika tiştêkî din li ber min e, ew jî dîrok û çîroka malê min e, qe-bîla min e, aşîra min e. Ku min ew jî li ser xetê nivîsand, em hêndu bi tevayî ji ber mirinê xelas diwin. Ew kurdûna me bi ber bayî çola Anatoliye nakeve û li erd û ezmana belav nabe!

Û tiştikî din; di van deh salan da li hêla Bîrnebûnê ez bi kurdekê Balayê Şenê va zewecim û ji wê bûm xadanê hîn du lawên din, yê ku ez lê umîd-warim ewna fikir û ramanên min û kurdîya Anatoliya Navîn di pêşerojê da jî bidin jîyandin, yê ku ez bi he-bûna wan pîrr dilşad û bextewar im, tehma jîyana min, Berzan Mikailî û Mîran Mikailî.

Ji ber ku ez bi navî xu yî resmî ya tirkî, Yildiz, qayîl ninim û naxwazim ku bila navî eşîra min Mikailî bimire, min navê xu yî di kovarê da li wana kir, da wana jî!

Kî diwêje meri û gel dimirin?

Kî diwêje vejîn tune ye?

Aha ji wan ra bersiva min;

**BIRNEBÛN!!!**



.. Destê bi tenê, deng jê navê..

# BÎRNĒBÛN

## Yazı kurulu davet ediyor...

Orta Anadolu Kürt toplumu'nun uzun zamandan beri Özlemini ve gereksinimini duyduğu Politika, Sanat ve Kültür dergisi Bîrnêbûn nihayet çıkıyor.

Dergiyi tanıtmaya, yayın politikası üzerine tartışmaya en önemlisi de bir birimizi tanıma amacı ile bu toplantıyı düzenlemiş bulunuyoruz.

Orta Anadolu Kürt Toplumunun nesnel gerçekliği üzerine kafa yoran, bu özgülde bir şeyler yapılmasına inananları ağızdaki tarihte buluşmaya davet ediyoruz.

Yer: Kafee Museum

Lenzmann str. 2 DUISBURG (Bahnhofın karşı)

Tarih: 23.Kasım 96 Saat: 12.00

İletişim: Dr.Fikret Yıldız, Faks-tel: 0203/427369

.. Orta Anadolu Kürtleri olarak, Bölgemizde'ki gelişmelere karşı her zamankinden çok, daha duyarlı olmak durumundayız. Ulusal kimliğimizin ekseninde şekillenen çatışmaların geldiği nokta bunu zorunlu kılıyor.

Türk siyasi alana iyi analiz edildiğin'de, görülecektir'ki; Yaşadığımız coğrafya yeni ve farklı gelişme ve çatışmalara gebe. Sömürgeci Devlet „Kürt savaşta“ düştüğü handikam aşmak için Orta Anadolu'ya yükleniyor. Toplumsal desteğini ağırlıkla bu bölgede arıyor.

Başarılı olmuyor'da değil. Kürt ve Türk nüfusun birarada yaşadığı yerleşim birimlerin'de Faşist, Gerici ve savaş taraftarı Partiler toplumdun yoğun bir destek buluyor, kurumlaşıyor. Sistem'de gün geçtikçe bu alanı büttünleştiriyor. Savanna Toplumsal bir görünüm kazandırıyor.

Bu ve bunun gibi bir çok neden Biz Orta Anadolu Kürtlerini nesnel gerçekliğimiz üzerine bir daha düşünmeye zorluyor.

Geleceğimizi belirleme konusunda gerekli olan inanca ve dinamizmin oluşması, Haldeki konumumuza Tarihsel perspektifle bakma ihtiyacını karşılayacak platformlara olan ihtiyacı ortaya koyuyor.

Tam da bu nokta'da BÎRNĒBÛN dergisi çıkıyor. Orta Anadolu Kürt Toplumunun Özlem ve Gereksinimlerine yazıt verme istemi ile yola çıkıyoruz. Politika, Sanat ve Kültür ağırlıklı Dergimizin Toplumumuzu bir araya getirme, tanıştırmaya ve karşılıklı görüş alış verişine zemin hazırlama yönünde çabaların'da olacaktır. Bu çabamızın sembolü Kasım 96'da Bîrnêbûn'da yapılacak Tamama Toplantısı olacaktır.

Belevoka agahdariyê ji bo derketina kovara Bîrnêbûnê

## Xelata kurteçîrokan di şahîya 10-saliya Bîrnebûnê da hat dayîn.



Foto: Anders Rydell

Xelata yekemîn:

Bi motivesyona: bi gotin û vegotina  
xwe ya hunerî, bi estetîka xwe ya  
trajîkomîk **Zêbika Bekir Darî,**  
**Bi destê Nuh Ateş** bo  
Bekir Darî hat dayîn



Foto: Anders Rydell

Xelata duwemîn:

Bi motivesyona: bi melodramîya  
navaroka xwe û şeweyê vegotinê,  
**Fedekariya Mem Xelikan,**  
li ser navê wî Rabiya Dogan ji  
destê Yusuf Yeşilöz wergirt.



Foto: Anders Rydell

Xelata sêyemîn: a) **Sepana Qîto** li ser  
navê Abdulhalik Duran, Muzaffer  
Özgür ji destê Hilmî Yeşiltaş wergirt.



Foto: Dr Mikailî

Xelata sêyemîn: b) **Pêketin** li  
ser navê Berzan Çelebî baldûza wî  
ji destê Vahîd Duran wergirt.

Motîvasyon: bi asosiyasonên xwe  
yên şîret, şewir û şîyariyê herdu  
kurteçîrokên xelata sêyemîn:  
**Sepana Qîto Abdulhalik Duran,**  
**Pêketina Berzan Çelebî** bûn  
xwediyên xelatên îsal.

# Em gurçikeke Kurdistanê ne

Îrfan Baysal

Kurdên me yên Anatoliya Navîn pir caran li ser dîroka xwe mûnaqaşa dikin. Na ku em kî ne yan jî em ji ku hatine. Em kurd in û em ji Kurdistanê hatine. Pirs em kîngê û çima ji Kurdistanê hatine? Yan jî çima jê hatine veqetandin? Îro çima em bûne gurçikek Kurdistanê.

Ez dixwazim li nav dîrokê li bersîvên van pirsana bigerim.

Hatine me ya Anatoliya Navîn pir kevn e. Ez di dîroka dorberî me da dusad salan wêdetir diherim. Pir tiştên gotin. Lê li ser Kurdistanê û li ser koçberîyê tiştêk nayê gotin. Ji xêr destanî Memê Alan (Mem û Zin). Ez bawer im ew jî li wê demê henek melleyên xwenda anîwûn ziman. Ne ku bi xwara ji Kurdistanê anîwûn. (Berî Ehmedî Xanî ji Kurdistanê derketibûn.)

Mina ku hûn dizanin di dîroka Osmaniyan da şerekî bi nav û deng heye. (Çaldîran Savaşi 1514 Van Ovası) Va şera di navbera Yavuz Sultan Selîm (Osmanî) û Şah Îsmâîl (iranî) da ye. Kurd axzê Şah Îsmâîl digrin. Li dijî Osmaniyan derdikevin.

Li gora Prof. Dr. Gokhan Çetinkaya, İstanbul Teknik Üniversitesi “*Bu aşiretler hiç bir zaman Osman-*

*lı tarafından kontrol altına alınamamıştır.*”

Di vî şerî da Osmanî bi ser dîkevin. Li gora Niyazi Akşit (Dîrokvan, Milli Eğitim Bakanlığı Tarih Lise 1,2,3, 1978) piştî şer deh hezar xortên kızılbâş ji serê xwe dibin. Ên din jî koçberî Engurîyê (Ankara) dikin. Elbet va koçberî bi salan dajo.

“1578 çıldîr savaşı” di vî şerî da Hozan Xayalî li ser xofa Osmaniyan helbestek nivîsiye.

*Turnam gider isen bizim ellere  
Vezir Ardahan'dan göçtü diyessin  
Karşı geldi Kızılbaşın hanları  
Çıldır'da bir kiriş oldu diyessin*

*Al kana boyandı çıldır dağları  
Gaziler dikteler..... Tugları  
Gözü kanlı Diyarbekir beyleri  
Din yoluna şehit düştü diyessin*

*Çamur dize çıktı kan ile yaştan  
Atlar dalmaz oldu serilen leşten  
Kaleler yığıldı kesilen baştan  
Ak gövdeler kana battı diyessin*

Padişahê Osmaniyan Yavuz Selîm jî helbesteke xwe dinivîsiye.

*Kürde firsat verme ya Rab  
Debre sultan olmasın  
Ayağını çarık sıksın  
Asla iflah olmasın*

*Vur sopayı al ekmeği  
Karnı bile doymasın  
Ol çesmeden gavur içsin  
Kürde nasip olmasın*

Çima em navên lawên xwe Şah  
Ismâîl datinîn?

Li Anatoliya navîn (Enqera, Qonya,  
Aksaray, Nixde û Qirsehîr) li dor  
mîlyonek kurd dijîn. Piranîyên wan  
bi kurmancî deng dikan. Hendik şêx-  
bizinî (Haymana) hendik jî bi dimilkî  
(Aksaray) deng dikan. Li gora eşîretan  
jî ku em mêze kin ne ku ji şunekê hati-

ne. Ji temamiyê Kurdistanê hatine ve-  
qetandin. Ev aşîret;

Sêvki, Mîfki, Omerî, Cudkî, Nasirî,  
Şêkikî, Bilkî, Xelkî, Celkî, Terkî,  
Mamitî, Sêwedî ne.

Bi qasi ku ez dizanim kurdên  
Anatoliya Navîn giştik mûslûman in.  
Mezheba wan jî henifî ye. Bala we  
bikşînîm ser vê yekê ku li Kurdistanê bi  
piranî şafi ne. Osmanîyan çar mezhep  
heq qebûl kirine. Ev mezhep henifî, şafi,  
malîkî û hembelî ne. Li gora Osmanîyan  
alewî (kızılbaş) mezheba pêncê bû.

Nêrîna min ew e ku kurdên Anatoliya  
Navîn alevî bûn. Bi zora Osmanîyan  
bûne musulman, bi ser da ji hatin ser  
mezheba wan.

Îro pişt her tiştêkî em kurdên  
Anatoliya Navîn gurçkikeke Kurdistanê  
ne.



Pîrozbayîya 10-saliya  
Bîrnebûnê li ser DVD  
hatiye parastin. Ên ku  
bixwezînin, dikarin li  
navnîşana Bîrnebûnê  
peyda bikin.

# Li ser dehesalîya Bîrnebûnê

Rebenî Celîkan

Îro bi tamamî dehe sal qedîyan.  
Dehe salên dirêj yan jî qut.....  
Nizam ku çend ro û çend şevan di-  
keye?

Lê îro va dehe sal in kovara  
Bîrnebûnê dest bi weşana xwe kirîye.

Kovara kurdên Anatolyê  
ya çandî  
ya hunerî  
ya siyasî  
ya cîvakî  
ya hebûn  
û ya tunebûnê

.....  
Di van dehe salên derbasbûyî da ku  
Bîrnebûnê têda hat weşandin

Çi bû?  
Çi qewimî?  
Çi guhartin di nav cîvaka kurdên  
Anatolyê da çêbû?

Ferqên rewşa kurdên Anatolyê yê  
wê demê û yê îro çi ne?

Kurdên Anatolyê bi ber va kuda de-  
rin?

Ez dixwazim tê biqerşim ku bersîvên  
van pirsan bidim.

"Kurdên Anatolyê ku ziman û çan-  
da xwe bi sedsalan parastinî îro hêdî

hêdî dev ji çanda xwe, zimanê xwe ....  
.....

....."  
Lê li min biborin, ez nexwazim  
dawîya vê gotinê bînim.

Dilê min naye ber min ku ez dawîyê  
binîvsînîm.

Zimanê min, pênuşa min nareye  
.....

Destên min sist dibin.....  
Ezê çawa binîvsînîm ku;  
Kurdên Anatolyê êdin ro bi ro di  
nav çerxa asimilasyona dewleta tirk da  
tên xwarê.

Ezê çawa binîvsînîm ku;  
Ew însanên ku li dijî ewqas salên  
di ser veqetina wan û Kurdistanê ra  
derbasbûyî ra, zimanê xwe, çanda xwe,  
hebûna xwe parastinî, îro nikanin li  
ber xwe bidin....

Ezê çawa binîvsînîm ku;  
Kurdên Anatolyê bûne gul-çiçekê  
nav êr, ro bi ro dişewtine, rengên wan  
yên kesk û sor û zer vedimirine, reş  
dibine. Ma here dawîya vê nivîsê jî  
veng teva nekirî bimîne. Rewşa kurdên  
Anatolyê, yan jî kurdan bi gîştî, îro  
çawa ye? Çima veng e? Herkes pê di-  
zane. Ez naxwezim van tiştana dubare



bikim û ne dilê xwe ne jî dilê kesekî din biêşînim.

Lê em, em ê hemperê vê rewşa dijvar çi bikin?

Bîrnebûn bi tenîya serî xwe li hemper asimilasyonê çi dikane bike? Em ê çi bikin ku dawîya vê nivîsê li gorê dilê xwe binivîsînin?

Li ser vê yekê meriv dikane bi hezaran rûpelikan binivîsîne, bi sedan pêşniyaran bîne.

Pêşniyara min jî ew e ku;

Bîrnebûnê bi derketina xwe va ji bo kurdên Anatoliyê gaveke pir girîng avêt. Ewna ji xewa kurr şîyar kirin. Kurdên Anatoliyê ku heta biderketina Bîrnebûnê bi awayekî dizikî, sergirtî dijîyanî êdi bi nasname xwe va, bi kurdîtiya xwe va xwe avêtin meydana. Xwe dan nasandinê.

Lê paşîya ew heyecanê ku bi derketina Bîrnebûnê va di nav gel da peyde bûyî, nehat. Belê Bîrnebûn karekî pir girîng dike. Îro kovara

kurdên Anatoliyê ya bi tenê ye ku li ser çanda wan, hûnerê wan cîvakên wan lêgerînan, lêkolînan çêdike. Lê ew yeka bi tenîya serî xwe nikane li hemper vê tehdîda asimilasyonê ku gelî me di nav da ye, bisekine.

Ango Bîrnebûn êdin bi tenîya serî xwe têrê me nake.

Gerek e em li kêleka Bîrnebûnê tek-nikînê hîn cihêtir jî binîn bikaranîne.

Wek mînak;

Radyoyekî ku ji kurdên Anatoliyê ra weşanê dike. Lê ne li Ewropayê. Li Kurdîstana Anatoliyê, li Qulekê(Kulu), li Cîhanbeylîyê, li Qirşehrê hwd.

Eger radyoyekî veng hebe, bawerîya min ew e ku têsîra wê yê li ser gel yê jî yê kovarê hezar carî bihêztir bibe...

Erê, ez jî bawer nakim ku vekirina radyoyekî veng karekî hêsan e, Rewşa dewleta tirk li meydanê ye. Dibe ku ew ê ku ez dibêim xeyalek be..

Lê dîsa gerek e em hêzên xwe ji bo bicîhanîna vê xeyalê binin karanîne.

# Li zimanê xwe xwedî derkeve! Zimanê te hebûna te ye!

## Li ser şeva “Bîrnebûn”ê

Nebî Kesen

Kovarekbinavê “Bîrnebûn” di tarîxa kurdan da ji pir alîyan balkêş û girîng e. Ji bona vî



Foto: Dr Mikailî

pîrozbayî ya dehsalîya kovarê jî ewqas bi mane û qîmet bû. Beşdarbûna nêzikî 400 kes li şeva “Bîrnebûn”ê divê bi vî maneyê bê famkîrin. Cihê pîrozbayî paytexta Swêdê Stockholm, mesajek din ya şevê da berçav: navenda pêşvabirina ziman û çanda kurdan li Ewropa, ku kurdên Anatolîyê jî di nav wan da ne, Swêd e.

Armanç û naveroka şevê pîrozkirina dehsalîya “Bîrnebûn”ê bû. Loma, mûzîk û govend di şevê da li pêş bûn. Gora programê, ku bi bîryara amadekaran (organîyatoran) ra gîrêdayî ye, armanç, xebat û encamên di dehsalên “Bîrnebûn”ê da li şeva pîrozbayî hindik hatin gotin. Ev kemasîyek mezîn bû û rexneyên di vi warê da di cih dane.

Beşdarên şevê gelek balkêş bûn. Ji rêxistinan, medya û civata kurd pir şaxsîyet hatibûn. Mehdî Zana, Rohat Alakom, Amed Tîgrîs, Mahmud Lewendî, Hesênê Metê, Murad Ciwan,

Siddîk û Şermîn Bozarslan, Keya Îzol, Cemal Batun, Vîldan Tanrikulu û kesên din bi beşdarbûna xwe

kefxweşî û alîkarîya xwe bi “Bîrnebûn”ê û Kurdên Anatolîyê ra dan ziman. Roja şeva “Bîrnebûn”ê şûn da li bajarê Stockholm konferansek li ser ziman pêk hat. Di vir da, bi navê “Bîrnebûn”ê Alî Çiftçi axaftinek li ser pîrsa ziman û kurdên Anatolîyê kir. Axaftvanên din (Amed Tigrîs, Samî Tan û Mueyed Teyîb) jî Kurdîstana Bakûr û Başûr bûn. Di şevê de û di konferansê da hat ditîn ku, Kurdên Anatolîyê ji alîyê xebat û jiyan êdi bûne beşek gelê kurd.

Ji dora redaksiyon û nivîskarên kovarê jî gelek kes beşdar bûn şevê. Du helbestvanên Kurdên Anatolîyê Xizan û Kadîr Çelîk di şevê da amade bûn, lê mixabin tû helbestên xwe nexwandin. Kemasîyek ji alîyê şevê ew bû ku, Kurdên Anatolîyê yên li Stockholm û bajarên Swêd yên din, gora potansiyela wan, kêma beşdarê şevê bûn. Wek tê zanîn, li Danîmarka hejmarek mezin yên kurdên Anatolîyê dijî. Lê,



Amed Tigris, Ali Çiftçi, Robin Rewşen, Mueyed Teyib û Sami Tan, 30 nîsan 2007

Foto: Dr Mikalî

beşdarbûna ewan pir kê m bû. Ji welat jî qet kes nehatîbû û divê li ser vî mijarê bê nikaş kirin.

Dorûber yên komelan û malperên kurdên Anatolîyê li Ewropa ji alîyê pîrozbayîya û xebata “Bîrnebûn”ê bê deng man û qet alîkarîyek pêk nehanîn. Pirranîya wan behsa vê bûyerê nekirin û berpîrsiyarên xwe beşdarên şevê nebûn. Dawîya pîrozbayî qet nûçe û şîrove di malperên me da nehatin çapkirin. Bi kurtî, komel û malperên kurdên Anatolîyê bê elaqe man. Ev pir şerm e û divê bi eşkere bê rexne kirin.

Şeva “Bîrnebûn”ê fîrsetek bû, ku xizmet û hewldanên kovarê û xebatkarên wê di raya gîştî ya li welat û Ewropa da bèn nas, şîrove û niqaşkirin. Amadekarên şevê çiqas li ser vê babetê gîranîya xwe dan, nayê zanîn. Ji bo xwendin û belavkirina “Bîrnebûn”ê bûyerên wisa giring in û dive bèn îstîfade kirin. Mîmkûn bû ku, wek

nîmûne, li Swêdê kampanyayek abonê dest pê kira. Pîrsek tê aqil ew e ku, yek beşdarek dawîya şevê bû aboneyê “Bîrnebûn”ê? Di vî warê da tişteke balkêş û pozîtîf jî dikare bê gotin: di şevê da kurdekê Maraşê çend ciltên kovarê kirî bû û dixwast hejmarên kevn jî bibîne û bixwûne.

Barê giran ya şevê li ser milê hevalên li Swêdê bûn. Alî, Harun, Seyfî, Mecîd û Hamît serê wan hevalan dikşandin. Ji alîyê spas û teqdir kirin, divê navên wan kesan li vir bê gotin. Xebatkar û nivîskarên “Bîrnebûn”ê ji Elmanya jî gelek hebûn û alîkarîya xwe kirin.

Daxwazek din ya di dil da ew e ku kurdên welat, yên li Danîmarka û Swêdri jî pirtir xwedî “Bîrnebûn”ê derkevin û alîkarîyekê pêk bînin. Komel û malper, divê, kovara “Bîrnebûn” wek platformek xwe bibînin û saya kovarê da nasnameya kurdî hîn jî pêş va bibin.

## GOŞTÊ XINZIR

### MEM XELÎKAN

Roke yekşemîyê Îbram, ji mal biderket. Xwe avite, kolanên bajarê Bremen'ê ji bo ew roka tatîlê wû, dixwast wexta xwe xwaş derbas bike.

Li kolanê, ser der û rêya vî çiqas dûkan û vîtrinên wana hebûn giştik yek bi yek temaşe kirin û nêrîn. Li wê gera xwe, mêze kir westîyaye. Dor û paş xwe nêrî, dereke lê çayekê wexve û vêsê gerîya. Bi qasî sed an duhsed metroyî çû rastê bexçekî çayê hat. Çû û li masekê rûnişt, banga qarson kir çayek xwast. Çaya xwe qult bi qult, bi kêfekî vedixar. Di serê xwe de jî, mal xule dikirin.

15-20 sal in, li vî welatî xerîb, vî bajarî yad karkerî dikir. Gelek hemwelatîyên vî hebûn, li wira. Lê Îbo qet bi kesî re navbera xwe neyê xwaş wû. Îbo, bi xwe û xwe digot <<Wana ne tu mêr in, rindî û xeravî yan ji hev nakine derê. Hevalekî mîna min î canfeda qîmetê nizanîne>>. Banga qarson kir, çayek din xwast. Di wê navberê de, du xort hatin li masa kêleka Îbrêm rûniştin. Guh da ser wana, mêze kir herdu xort bi kurdî deng dikine, him jî bi devê kurdîya Îbram dizane. Îbram, bi wê yekê kêfxwaş bû. Raste hemwelatîne xwe hatiwû. Rabû, çû maseya wana.

– Merheba xortino, hûn ji kê derê ne?

– Merheba, em ji Konyayê ne. Got, Hecî.

– Navê min Îbram e, ez jî ji Kurdên Konyayê me, kurdên Kuluyê. Lê hûn? Ji wan xortana, Hecî yê bi salan mezin; – Em jî, ji gundekî Kuluyê nî. Navê min Hecî, yê hevalî min jî Miçe, got.

Hecî û Miçe, çayek îkramê Îbrêm kirin. Her sêyan, demeke dirêj sohbet kirin. Sohbeta wana, li ser welêt wû. Gundên hevdu, ji gundên hev; kî, kê nas dikê ji hev pirsîyan. Her sê jî li vî welatî xerîb, ji bo ku raste hevdu hatine pir kêfxwaş bûn. Hecî û Miçe tebe wûn. Li Bremenê dibistana bilind dixwandin. Ew herduyana, bi naskirina Îbrêm hê kêfxwaş bûyîwûn. Bi ser wê sohbeta xwaş de, navnîşanên malên xwe dane hevûdu. Ji bo ku ji wê rokê şuva jî li hevdu bigerin, şor dane hevdu û xatir xwastin û veqetîyan. Dû wê rasthatinê re her sê heval caran li vî bexçeyî pir caran jî li mala Hecî û Miçe, digêheştine hev û navbera wana de hevaltîyek baş çê bû. Hecî û Miçe; xwendevan wûn. Wexte

wana yên herin mala Îbrêm tune wû. Her şemî an jî yekşemîyê, Îbram dihate zîyareta wana. Li wir, nanê xwe dixwar, çaya xwe vedixwar, sohbeta xwe dikirin û bi hurmetekî mezin jî bi rê diket. Li her hatineke xwe jî, digot;

– 5 - 6 meh in, em heval in. Hûn qet nehatin mala min. Ezî tim tême mala we. Hûn telebe ne, qezenca we tune. Waya li min pir bi qar tê yê. Carekê werin mala min, ka ez ji we re çî xwarina hazir dikim. Ez, xwarina pir baş dikelînim. Eger hûn, nehatin carek din ez jî nayêmin vira û qet li we nagerim, got. Hecî; ji bo xwarin û qirikê ve pir xerav wû. Wa ya teklifa pir çû xoşê. Bi ser wê gotinê Îbrêm de;

– Miçê; Îbram rast dibêje. Heftî pêş me, em mîvanê Îbrêm in got.

– Miçê; kekê, tu dizanî got.

Îbrêm;

– Erê, heftê pêş roja yekşemîyê hûn mîvanên min in. Ez ê ji we re bi dest xwe xwarina çêkim. Werin carekê jî, ez hizmeta we bikim. Ez ê bende-war bim, got û xatirê xwe xwast çû. Hecî, mîna ku der rê ya hecacî ya dipa, bi ben yekşemî berve xwe dikişand. Yekşemî hat. Hecî û Miç, ketin rê herin mala Îbrêm. Gêhiştin mala Îbrêm, Îbramî di teleşeke mezin de wû. Çay hazir kiriye, sifre dadigirt. Dû çay wexwarinê ve, Îbrêm sifra mîvana çêdikir. Xwarin hat; Zeleteke qampîra û

yek kase dev bûn. Hecî, ev sifra dît şuva mirûz tahl kir û xem û xeyalên vî yên ji bo xwarina wê rokê ve, Gihîştik berba bûn û belav bûn. Hecî û Miçê, ji fedîyan re yek parî ji zeletê xwarin û dev vexwarin, ji sifrê bi dûr ketin. Hecî;

– Îbram, te zehmet kiriyê. Em, hê bi rê neketin me xwarin xwar û em hatin. Emê têrin. Qusurê me, nenêre. Ne bê; nana min di qavê de cihîştin. Tu dizanî, em xwendewan in dersê me hene. Te misade kir, em dixwazin herin mal. Xatirê xwe xwastin û bi rê ketin. Herdu heval, kor poşman, vegehrîn. Hecî; bi rê de, vî Miçê re ji bo Îbrêm <<qe tu yê, carek din jî werî, ez, dizanim ji te re çî bikim.>> got.

– Miçê; çima?

– Hecî, ka xwarinên xwaş, ka xwarinên Îbrêm xwe pê dipesandin wana ne? Ez, dizanim li te çî bikim. Got. Du hefta şuva, Hecî ji der goştinê berxa û xerca malê çî yê kirî, bi kêfekî xwaş hate mal. Ew gošta da ser êr, zelete – meze û ji vexwarinê re çî tê bîra we, ew hazir dikirin û masa ya xwe ya xwarinê dixemiland.

Miçê;

– îşalla, Îbram huro nê, got.

Hecî;

– Xwaska were, ez dizanim çî bikim. Di vî devî de, ji der de di pencerê de qeratî ya Îbrêm xuya kir û zîlê derî lêket. Miçê, derî vekir û Îbram kerem kir, anî



hundir. Hecî, silav da Îbrêm û çerxe na salana şuva ezî goştê xinzir bixwime? masa ya xwe bû. Ew wek dixwaze xemi- Zati ez î rûnenime. Herime cem he- land şuva, bane Miçê kir; were em, xwa- valekî. Ez, davetkirim. Min go, ka hûn rina xwe bixwinê got. Ji Îbrêm re jî <<Li çi dikine pêçekê we bipirsim, derba- qusûrê nenêre Îbram, ezî te jî dawete se cem vî hevalî bim. Got û biderket. masêkime; lê waya, goştê xinzire.>> got. Dû vê, Hecî ji Miçê re; <<De here, ku Îbrêm – na na, ew çi yê. Istafrilla, ji wa- tu herî Îbram>>

## Çêroka Hesî Lûlê

Li gundeki di malakê da jinek bi lavikî xwe va diman.

Navê dê Bes û yê lêwik jî Hes bîye. Le vira, jê re digotine Hesî Lulê.

Diya wî Bes li ser xwe bîye, Hes tenkî fiqare bîye.

Rojekê li gundekî din yek dimire, haval û ciranê Besê xeberê didine Besê dibinê were em herin şinê.

Bes hema xwe dipiçe û haziriya xwe dike bang lavikê xwe dike û dibê Hesî mino, were vira, ezê ki herime şinê li bendê qêpê (derî) be, hetak ez têm! Hes dibê; tamam Eyê!

Bes bi hevalên xwe va terin. Hes dipê û dipê heta roava. Mêz kir ku diya xwe nehat, qipê ji ber deke û li pišta xwe bar dike tere heta herda diya xwe.

Bes ji qêrşî va dibîne ku yekî qapi li xwe naye, têye. Ki nêzik dibe, dibîne ku Hesê wê ye. Bergindê tere dipirse, va çî ye Hesî mino?

– Ê te got; miqeta derî be. Min pa tu nehatî min derî ji ber kir, hatim herda te.

– Qê min negot; tenê miqata derî be. Min got miqeta malê be jê!.. Lê Hesî Lulê veng fam kireye û derî jêkiriye û dayê pišta xwe heta ba diya xwe aniye.

Diya Hesî Lule li ber xwe dikeve û dibê eza xêrnedî min a wa rojana jî bidîtana...

Altun Başaran

**NAME**

Çend rojan berê  
Li dawîya gund  
Meşeke berêvarê  
Nameya te ya çav kilkirî  
Dest min de  
Ya ku ji çavên peyvân de  
Xwîn dibarî

Roja, ku tîrêjên wê yên  
Kezîzer  
Ya li ber ava  
Ji dilê min de keserên kûr  
Rakirin ser pî ya

Min jî  
Nameyek dest bi hinne  
Bi peyvên lâl nivisandî  
Berba kir û kire rê

Delalê  
şev xemgîn û bê dawî ne  
Bê xew bendewarê  
Stêrka sibê me  
Yak û min şad bike  
Silaveke te yê germ e.

Mem Xelîkan

# Bo dehsalîya Bîrnebûnê

Pîroz bibe li gelê me, dehsalîya Bîrnebûnê  
Tu bû berxwedana Kurdên Anatolîya Navînê  
Xebatên te fêkî dan, va ye gel li dor te ye  
Tu bû stranek gelerî, li hember tinebûnê

Xebatkarên kovarê, ew ciwamêrên bi xîret  
Bi nivîsên xwe'y hêja, ronahî didin mîllet  
Him li derve him l'welat, îro keç û xortên kurd  
Bi sedan, bi hezaran hişyar dibin ji zîllet

Em bîr nebûn, bîr nabin, jibîr nakin ti carî  
Dilê me de tim heye, evîna kurdewarî  
Dil de birîn, dil de xem, dil de mane pîrr hesret  
Êrîşa ser kurmancî, me xîst nav ax û zarî

Koçber in, gawestî ne, bi sedsala em mane  
Ji vir pê de bîr nabin, kî dibê em helîne?  
Li dîrok û li zimên, Bîrnebûn xwedî derket  
Bo hunera me bingeh, ser çanda me baran e

Dehsalîya te pîroz be, heta dehsalekê din  
Bi te em serbilind in, keç û xort û mêt û jin  
Silav bo Bîrnebûnê, çavkanîyek dîrokî  
Anatolîya Navîn de mekteba zimanê min

Hilmi Yeşiltaş

## DAYÊ

ev zîndan e  
ez çima li vir im  
ev yeka min fahm nekir  
çima ne li cem te me  
zîndan bûye leyistika min dayê  
pir roj derbas bûn  
hûn min dixepînin  
çima venagerim mal  
min bîra te kir dayê  
em bêyî hevdu najîn  
ev esarete dayê  
dijmin zilmê li me dike  
serhildana me  
di çavên dijmin de  
bû xençereke tûj  
em di nav bombe  
û jehra dijmin de  
mezin bûn dayê  
li zîndana Amedê  
li nasnameya xwe  
xwedî derketin  
bêhna beybûnên deşt  
û zozanan  
tê pozê min dayê  
ji bo azadiya welat  
û gelê kurd  
wek şêrvanan li ber xwe didim  
ev neheqiya ku li me bûyî  
dîrok ji bîr nake dayê  
çima em li ser axa xwe koçber in  
ev pirsgirêk ya hezar sala ye

Ramazan Kesen

14-07-2006 / Yenîceoba

## Bostanê

Bostana Elî–Fatê  
Biçûk, mezinan dilketê  
Ez helandim xelatê  
Hele hele Bostanê  
Bi şohret û bi şanê

Bostan çûye bêriyê  
Avêtin nav gêriyê  
Serê xortan li deriyê  
Hele hele Bostanê  
Bi şohret û bi şanê

Bostana Xelî Horê  
Xortan xwe daye dorê  
Çavreşê sûret sorê  
Hele hele Bostanê  
Bi şohret û bi şanê

Bostan çûye nav daran  
Çû ber berixa û karan  
Bostan xwişka heft biran  
Hele hele Bostanê  
Bi şohret û bi şanê

## Xerîbî

Em hatin xurbetê, rabûn ketin rê  
Me go qey gavur me gêr kin rokê  
Ereb, ecem û ta Sirinlankê  
Heftêûdu millet me dîn li xurbetê  
Va çi kare me ye ku li me bû zerar  
Navberê du rîyan me nedî qerar  
Qurban serjêkirin, xwar goştê mirar  
Heram heram em çerx bûn li xurbetê  
Lawikê me mezin bû me ew zewicand  
Ziyan zeviyên me xelkê ji xwe re çand  
Me ne zenat kirî, ne mektep xwend  
Cahîl cahîl em man li xurbetê  
Zar û zîçen me çûn dîskotekê  
Bûkê cih hişt roja dawetê  
Nizane xal, xwarziyê, metê  
Biçûk û mezin neman li xurbetê  
Lawikê yek hirsiz nedabû ser me  
Jinika me êdî ranabe ji ber me  
Havîna vir sar e zivistan germ e  
Bihar û payîz ji bîr kirin li xurbetê  
Malê dinê ji me re nabe tu derman  
Carek dere îznê ku pere li ber man  
Ne li vir rehet e ne ku li wira ku em man  
Bi xweşî em ketin mezeli xurbetê

Bayram Özcan



## GULSOSINA MIN

ez  
li feryad û fixana deman  
gerokê heyveroniya  
xewnên te me  
li baxê kelecana dilê xwe  
şereba tiriyên  
kefa destê te me  
xewên şevên min  
bêyî te tarûmar in  
li temenê xwe yê wêran  
tepînka kana madenê me  
germahiya hezkirina dil  
di gewriya min de  
bû gilokek werisandî  
min  
lezeta lêvên te  
di şewqa finda lertzok de kola  
di rûkeniya te de girî  
û di giriyê te de kenê xwe dît  
li bejn û bala te  
ya fîdanî  
hest li ramûsanana şiyar dibin  
ji kovaniya awirên te  
bêhna gulsosinan tê  
were  
êşên giyanê min  
li paşila pêlên lehiya xwe  
siwar bike  
bi rengê kenê şîn û narîn  
li qolincên asoyê min  
bialîne

şeweta kezeba min  
bi hênikahiya  
êvarên xwe  
vemirîne  
bi melûliya birûyên xwe  
toza gula hinavên min  
vemalîne  
êdî peyv  
li ser tîrsa lêvan  
hişk û ziwa bûn  
xewn û xeyal  
di kesera robaran de  
xeniqîn  
heyv  
li bêkesîya min  
stûxwar e  
helbest  
li tenetiya hilmgirtî  
di axînan de  
dinale  
were  
bêhtengî  
bedbextî  
û bêbaweriya min  
di tîrêjên şefaqa  
asîmana xwe de  
biperçiqîne  
bihelîne...

Xizan Şilan

2006–11–24, Stockholm

## HEVÎ YA MIN

demeke ku  
payiz hat  
ezê likê derê  
gulan bînkim  
ez dê liku  
xwe bi sîyê darekê dim  
ez dê li ser kîjan axê serqot û pêxas bigerim  
û li kîjan avan serî sibê bi rindan re ajnîyê bikim  
ez dê liku  
agire ke xwe dadim  
pêtî yên êr ji xwe re bi qûle kim  
helkişim qetî hefte  
ew dila ji bo kê tê û terê  
jibo çi herroj hestêrk vedikevine  
jibo çi herroj ro me germ dike

li kolanên gemarî û qilêrî  
ezî dibîni me  
ezî dibîhîzi me  
cawa zimanên bixwîn disûne  
û qurbangehên bi pacan dixemilîne

Seyfi Dogan

# MEWLÛDA MELE ABDURRAHIM

(YUNAK - KONYA)

BISMÛLLAHÎRREHMANÎRREHÎM

Berê k'em bixwînin metheyê Xwedê  
Paşê k'em herin bixwînin mewludê

Xwedê li hewan, li erdê Tu'y tek e  
Îşê ku Tu çêdike, kes şenake

Însên çêdike Tu li dilopek av  
Rih didiyê, şexsi rind, biri yû çav

Eyni navek, insan çeşid çeşid e  
Aqil qe nagê Ya Rebbi îşê Te

Tili-jiniyê însên qirm e qirm e  
Biru ser çava ra, tê bê qey sirm e

Şexsê wan Te çêkiriye ta ezel  
Îşek Te abes nîne, gişteki gozel

Ferq dike gêre şev lêdixê izê  
Xişirtiyê wê gêre tu dibihisê

Tu mezinê Padişahê padişaha ne  
Tu xaliqê temamê van îşa ne

Xwedê Tu yi ewwel e, Tu yi him axir e  
Însan vê nafikire qelbi kwir e

Xwarin Te ti nê, ne nan e ne av e  
Tu li kesî nebû, ne dê ye, ne bav e  
Xwayî nîne, ne Te mal e, ne şûn e  
Haşa ne Te ewlad e, ne Te jin e

Tu yi bêheval e, ti nîne kesî Te  
Weka tişteki nîne him şexsi Te

Çunki 'Qulhuwallah' şahidê Te ye  
Meri giş bang kin, Tu li rev wan heyê

Ber melaikan, ins û cin, Tu hebû li berê  
Tu yi hazir e, Tu yi mewcud e li her derê

Ne Te can e, ne te ling in, ne dest e  
Ne Tu nexwaş dibe, ne Tu diweste

Rev Te gi yek e, ne ro ye, ne şev e  
Ne Tu mina mêxlûqêt radikeve

Erdê hewan dirak ti nîne li arê  
Him navê da ro û hiv wek finarê

Dabistiye him bê sitûn va qubba  
Gi li qudretê Te ye, qe tinê şuphe

Te vana çêkirine ser hev qat qat  
Di nav van da him curbicur maxluqat

Nav wan da gerek moti gerek masî  
Rizq didiyê, Tu bîr nake qe kesî  
Gi çi îşî dîkin, Te yî heye ha jê  
Gerek xêr, gerek şer, Tu yê bibê paşê

Mulla çiqesî gunehkar e gerçî  
Disa Te rokê nehiştiye birçî

Aciz im, şukurê Te dikim çito  
Qusurê min menêre Ya Rebbi Tu

Tu dide me tal û tirş û şîrin e  
Sewa me vana gi çêkirine

Him maxluqat gi di bin emrê me da  
Van îşan gi li quwet–qudreti Te da

Sewa istifadê me ye vana sada  
Heywanat gi li me ra istifada

## MEWLÛD

Zêhin pêde mewlûda Muhammed e  
Ez bixwînim, Xwedê eşqê wî me de

Tim mewlûdê wî xwendinde, tu were  
Ancax rizê Xwedê li Pêxember e

Mewludê xwendinde, metirse mêsref  
Memnunke, ê gunê te kirinde ef

Mewlûd xwendin îkramê Pêxember ra  
Kefaretê vê him li gunê te ra

‘Pêxember hez dikim’ tu dibêye him  
Tu hez dike, mewlûdê xwendinde tim  
Mewlûdê xwendinde, ba razî bibe  
Şefaate bike mehşerê sewa

Xwendinde mewlûdê dilê me Ahmed  
Qiyametê tu qe nabîne zahmet

Tim xwendinde mewlûdê Resulullah  
Ba li te razi bibe Cenabî Allah

Mebê mewlûd sewa ticaretê ye  
Kê va go, bizane dilda fisq heye

Kê va pîrsa go, ewî zalim e him  
Guh mede wî, li wî bireve tim

Dijminê Xwedê û Pêxember e haşa  
Kê va go, îmanê wî yê nexwaş e

Hûn dixwazin cehennemê nebînin  
Pêxember ra k’em selawat’kê binin  
Esselatu wesselamu aleyke ya Resulullah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Hebibellah  
Esselatu wesselamu aleyke ya  
Seyyidenel ewweline wel axirin  
Selli ala Muhammed

Rind guh biserdin ey cemaat bira  
Çiqesî mezin e va Pêxembera

Rev Xwedê delal e pîrr Muhammed  
Şukur’ke tu li wî ra bûye ummet

Adem xaliq kir, Cenabî Ellah  
 Eniyê hebû nûra Resulullah  
 Cenabi Heq melaika ra got  
 Nûrê eniyê Adêm bikin sucud

Go 'secde kin, emirê Mîn bigirin'  
 Melaïke gi hatin secde kirin

Sewa nûrê Muhammed va secda bû  
 Mîna royê eniyê Adêm hebû

Paşê nûra Adêm bû dewrê Hewê  
 Çû zemanek qerar girt eniyê wê

Dehûnehe cêwi wê anîn dinê  
 Nûr neçû kesî, qe nelivî l'şûnê

Sekinî bû nûr eniyê Hewê tim  
 Şit hat dinyê, dewrê wî bû nûra him

Çû eniyê Şit qerar girt wê nûrê  
 Êpêy sal ragirtibûn li navberê

Şit şûnva çû gêhişt Hezretî Îdris  
 Nûr dewir bû tim haka cinsê temiz

Ew nûra çû Salih, him gêhişti Hûd  
 Nûra Muhammed vana li hev ra got

Cinsê temîz da nûra dihat daîm  
 Vê carê ew gêhişt Hezretî Îbrahim

Îbrêhim eniyê xwe nihêrî carê  
 Nûr tinê, di li eniyê Hacerê

Go ' Hacer bizane tu bûye hamîle  
 Zarî te lawik e, nav Îsmâil e

Cinsê Îsmêil lawikek were  
 Nav Muhammed e, ew son Pêxember e

Çito ku Îsmâil hate dinê  
 Nûra Hacerê wenda bû li şûnê

Li eniyê Îsmêil din ew nûra  
 Wê him çend bav ragirtine vê ara

Îsmêil bigre heta Ebdulmenaf  
 Ragirtine vê arê da bistûpênc bav

Nûr dewir bû tim haka zeman zeman  
 Hat gêhişt nûr qebila Qureyş Haşiman

Muhammed Mustefa çito ku hat dinê  
 Nûr çû eniyê qerar girt, gêhişt şûnê

Hûn dixwazin cehennemê nebinin  
 Pêxember ra k'em selawat'kê bînin

Esselatu wesselamu aleyke ya Resulullah  
 Esselatu wesselamu aleyke ya Hebibellah  
 Esselatu wesselamu aleyke ya  
 Seyyidenel ewweline wel axirin  
 Selli ala Muhammed

Nav Pêxemberan giyan va yi baş e  
 Xwedê dibêye, derew nîne haşa

Nav giyan da va yi bi qiymet e him  
 Rihê wî ra selawatê bînin tim



Hemd û şukur dike va aciz mulla  
Ummet kirim vi ra Cenabi Ellah

Hediyekê rihê min ra bişînin hûn  
Fatihakê rihê min ra bixwînin

Riza elillahil fatiha  
Selli ala Muhemmed

Va mewlûda Muhemmed zêhin pêde  
Him ezi'k bixwînin bi emrê Xwedê

Bi eşq guhbiserde mewlûdê Şerif  
Çito hatiye dinê bikim tarif

Hûn bizanin Êmîne diya wî ye  
B'emrê Xwedê, Abdullah hilgirtiye

Abdullah xorteki rind û pak bû  
Nav bajarî Mekkê da ewî tek bû

Pirr keçik bibûn aşiqê Abdullah  
Niyê hebû nûra Resulullah

Dû digerin, gi keçikê pak û baş  
Meyil nedikir, li eşqan dibûn nexwaş

Go 'ez hilnagrim li we qe kesî  
Ez ditirsim li Xwedê bibim asi

Ez xewnê da Êmînê nikah kirim  
Emrê Xwedê ezî ku wê hilgirim'

Haka go, keçikan eşqa xwe sar bûn  
Girîyan çûn, rev Abdullêh belav bûn

Abdullêh li wana meyil nedikir  
Daîme li ser Êmînê bû fikir

Çunki Êmînê pak bû, ê bê qusur  
Li eniyê wê ji hebû daîm nûr

Keçikê wî zemani gi top dibûn  
Mina Êmînê weng rindik ti ne bûn

Wan keçikan mijde kir Êmînê ra  
Go ' Xwedê îhsanek mezin kir te ra'

Gotin ' Yê ku te hilgire Abdullah  
Em naxta rev hatin, haka got wellah'

Êmînê bihist bi vê îşê pirr kêf da  
Bixwe berê li wê hebû ew sewda

Xwedê teqdir kirine.....  
.....va solixa min  
Devî min ra burcu burcu dihat bin

Çito ku emrê Xwedê, Muhemmed ma  
Nûra Abdullêh dewrê wê bû hema

Nûra Êmînê diavêt qul pencera  
Ecaib man, qe kesî nedîbû cara

Teeccub kir, herkeseki pakbûn lê di  
Eynî hûrî, ew ket başqe sifetî

Dehûduduyê Rebiulewwelê  
Dehûşêş bû Romî Nîsan wê salê

Êmînê go ‘ royê min bibûn teva  
Zanî Muhammedî bibê wê şeva

Mala Abdulmuttêlib bûm, ez hatim  
Nexwaş bûm, cihê xwe dayina, raketim

Min nihêri nava malê me bûye nûr  
Diwarê xwe yekî kesk bû, yekî sor

Him sê beyraq ser Kabê darda kirin  
Paşê ew beyraqana dudu birin

Yek berbi şerqê çû, yek berbi xerbê  
Yek sabit ma, li darda ma ser Kabê

Din Muhammed yan ilmê îşaret e  
Şerq û xerbê hûkum’ke şeriet e

Hûn dixwazin cehennemê nebînin  
Pêxember ra k’em selawat’kê binin  
Esselatu wesselamu aleyke ya Resulullah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Hebibellah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Seyyidenel  
ewweline wel axirin Selli ala Muhammed

Êmînê’k bibê çi diye vê şeva  
Rakir Xwedê çunki perde ber çava

Go ‘hatin melaika saf saf  
Mîna Kabê mala min kirin tewaf

Min nihêri li hev da çû diwarê me  
Şehadetê tinîne him darê me

Sê hûri vî diwarî da derketin  
Halê ihwalê min pirsin, ew hatin

Ew huriyan pak bûn, mîna berfê can  
Diran dêv da sipî tê bê qey mercan

Wana hatin Muhammed mijde kirin  
Xwe min werdan, çavê min ji paç kirin

‘Çavê te ronî be’ gotin ‘ Êmine  
Tu dike lawekî pîrr meqbul bîne

Xwedê qe va nedaye dêkê ‘ gotin  
Va serwerê Pêxemberan e butun

Doşeka min li bin mi da derxistin  
Yeka xas anîn li şûnê rêxistin

Min zani va doşeka dinyê ne ye  
Nava xwe îpek, kêlek ji surme ye

Go ‘ va doşeka, me anî li cennetê  
Muhammedî’k bibe rabe ser satê

Di wê doşekê da ramedandin wana  
Pîrr îkram kir, min ra wan hûriyana

Tasek şerbet dest da, xweş  
xweş dihat bihn

Wan hûriyan şerbet anîn dane min

Tasek biriçî bû ew tasa dest da  
Dane min, him wucudê min mist da

Mîna berfê sar bû, him mîna şêkir  
Heraret bir, kezeba min wê sar kir

Ew hûriyan yek Hewa bû, yek Meryem  
Navê xwe gotin, yek Asîye bû hem

Ebela min rakir Hezreti Hewê  
Şev bû, taxmin du saat hebûn siwê

Min nihêri deriyê malê me vebûn  
Wê wextê ew hûriyana hîn hebûn

Min dêrî nihêrî, teyreki sipî hat  
Peya bû li rev min, hev xist qanet

Hat piyê min bi quwetê mist da wî  
Êş li min çû, him wucudê min quwet dî

Hate dinê ew Muhemmed Mustefa  
Nûra Rebbê erd û sema wê şeva

Go hatin melaîka saf saf  
Mîna Kabê mala min kirin tewaf

Hate dinê, qey bê ro bû, ket Mekke  
Xwedê loma go 'lew lake lew lake'  
Go Qur'an dewama 'erselnake'  
Go rehmê e ew Muhemmed Mustefa

Ey cemaat em dabistin selamê  
Çunkî hat dinyê şefîê alemê

Aciz im, şenakim meth kim kelimê  
Pirr î mezin e Muhemmed Mustefa

Em ummet in, binêre vê îhsanê  
Vi ra çito'k tanzim nake îsanê  
Hate dinyê, qey bê barana Nîsanê  
Derdi me'r şifa Muhemmed Mustefa

Li ser Pêxemberan giyan e, vayî ustun  
Rûmenin eger cemaat hûn dost in  
Hosan mebin l'ser lingan em dabistin  
Em tezimkin li Muhemmed Mustefa

Selawatê li vir bînin ey bira  
Dêng bi hev din, bilind bibên li vira  
Rihê wî em şad bikin, tam hat sire  
Ba l'me razî be Muhemmed Mustefa

Selli aleyhî wesellimu teslima  
Hetta tenalu cennetel we neima  
Esselatu wesselamu aleyke ya Resulullah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Hebibellah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Seyyidenel  
ewweline wel axirin  
Elhamdulillahi Rebbil alemin, el fatiha  
Selli ala Muhammed

Hate dinê, maxluqat kir şad û man  
Go nûr vêket, li ser me pa bû dûman

Gotin ayet e, me lê adeletê  
Pirr însana xelaske l'delaletê

Naliya dinya, him va sada hat  
Melek tenê nebûn, giştik maxluqat

Her hêlê da va sada hat wê şeva  
Go merheba ya Muhemmed Mustefa

Merheba tu 'ke bine şerietê  
Merheba tu 'ke icatke teriqetê

Merheba wehşiyar bike medenî  
Merheba tu 'ke avake temiz dinî

Merheba li te ra Qur'anê'k were  
Merheba delalo, son Pêxember e

Merheba li alemê ra tu bû baran  
Merheba efkirinde gunehkaran

Merheba tu barana Nisanê  
Merheba heşyar bibe pîrr însanê

Merheba tê nêzik din bike îlan  
Merheba heşyar bike pîrr xefîlan

Merheba dinyayê naxta heye dîn  
Merheba wendake put, dinê adî

Merheba tu pîrr delal e ey hebîb  
Merheba ey gunehkaran ra tebîb

Merheba tu'k wenda bike dinî pût  
Hat sada, maxluqata giyan va got

Hûn dixwazin cehennemê nebîn  
Pêxember ra k'em selawat'kê bîn

Esselatu wesselamu aleyke ya Resulullah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Hebibellah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Seyyidenel  
ewweline wel axirin Selli ala Muhammed

Êmînê seri da diwêr westiye  
Merheba kê go, wê gi bihîstiye

Wê go min bihist va qisana haka bûn  
Westibûna çikê heşê min diçûn

Paşê aqlê min hat ser min, xwe hesiyam  
Min nihêrî Muhemmed tinê, tirsiyam

Ez giriyam, sewa wî meraq kir min  
Hêlê xwe niri min, xweş xweş têye bihn

Min nihêrî hatin ew keçikana  
Muhemmed dayinan-  
din hembêza min wana

Min nihêrî keçik wenda bûn, çûn der da  
Muhemmed giriya, çexbûn niriyan ser da

Min lê nihêri, berê sunnet kiriye  
Dest lê gerand, navê him jêkiriye

Digiriye, nahewiye hemêzê  
Min li hemêza xwe dayîna wê çaxê

Lêv dilivin, tişteki dibêye î  
Min anî guhê xwe da ber devê wî

Dibêye çî, qîsê wî min fam kir  
Ber Xwedê digere, i dikê zikir

Li hêstiran da xweyi nakine çav  
Dibê ya Rebbi ummetê min kirinde ef

Defter emelê van tu li vira çêke  
Li meydanê meşerê rûsway meke

Hisêb zû bibîne, mehêle li axirê  
Emel defterê wan tiji ke bi xêrê

Ser ummetê din ra ba be şeref şan  
Li qiyametê wan meke perîşan

Rokê top bibin diwanê Te emê  
Ummetê min mevê Tu cehennemê

Mehrûm meke ummetê min l'rehmetê  
Rû wan bide cemalî Xwe, cennetê

Berê xwe him ber Kabê kiriye  
Tijî çava ewî him digiriye

Xwe daxist erdê, kiriye sucud  
Êmînê go min bihist van pirsana got

Î li erdê da haka dibêye tim  
Ya Rebbi wey ummeta'm wey ummeta'm

Em hemd û şukur kin daîm ey bira  
Xwedê kir ummetê va Pêxember ra

Mehêle sunnetê Muhammed Mustefa  
Ba tu qiyametê nebîne cefa

Însafke sewa te haka kiriye  
Ber Xwedê geriye, rica kiriye

Hûn dixwazin cehennemê nebînin  
Pêxember ra k'em selawat'kê bînin  
Esselatu wesselamu aleyke ya Resulullah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Hebibellah  
Esselatu wesselamu aleyke ya Seyyidenel  
ewweline wel axirinSelli ala Muhammed

Çend eşrefê Mekkê wê şevê çûne  
Li Kabeyê Şerîf ew ziyaret bûne

Gotin wan 'em çex dibûn li tewafê  
Kabê secde kir, me dibû wê şevê

Min nihêri derket ew di bin perdê da  
Secde kir, ber Xwedê gerî di erdê da

Naliya ew, haka dihat sada  
Digo Ya Rebbi Te muradê min da

Muhammed hat dinê îşev, Kabê got  
Ecaîb man, me guh da ser, kir sucud

Hemd û şukur kir giştik van kevira  
Dibê em xelas bûn l'dest van kafira

Ê jê bikin misliman diwarên pût  
Sada hat Kabê da, va pirsana got

Çiqesî mubarek e go va şeva  
Hatiye dinê Muhemmed Mustefa

Go elhamdulillah min va roya dî  
Ez xelas bûm dest vi pût, dinê adî

Ê werin ziyaretê min misliman  
Devûrûyê xwe bi mi bidin ehlê iman

Xwedê li mumîna ra Ê min ferz'ke  
Ezê şîrin bim, herkesekê min hez'ke

Ê werin ziyaretê min her teref  
Rev wana ezê bibînim pîrr şeref

Ê werin dor mi ra çex bin safbisaf  
Gunehê wan ef bin, ê min bikin tawaf

Were xwendin him pênc wexit azan e  
Ez xelas bûm wan bêdin kafirana  
.....

Pêxemberî lê ra hat him wê çaxa

Nazil bû Qur'an Kerim ayet ayet  
Bistûsê sala da ew tamam bû hat

Însan delaletê da bû, şand Xwedê  
Qur'an Resulullah va gêhişt îmdadê

Pîrr gawir dibûn misliman, dihatin  
Xwedê dibê, ilmê zahir him batin

Ber xocekî nexwand, ummi bû ewî  
Xwedê paşê ilim giştik dane wî

Xwedê da wî xayet aqilekî pîrr  
Him i bi qenaat bû, him bi sebir

Rêçûna xwe ne pîrr zû bû, ne giran  
Bi miswaqê daîm wî dişûst diran

Bi quwet bû, tê bê qey tim î xort e  
Bejna xwe ne kin, ne dirêji, î ort e

Him ew ne yi goşt bû, ne yî zayîf  
Tê bê qey eniyê hilhatibû hiv

Him mîna berana top bû ortê poz  
Eniyê xwe ber bû, mîna textî dûz

Tî nebû qe zenaatek wî nedizanî  
Heta ilmê doxtoriyê dizanî

Ser rûyê xwe daîm wi digirt temîz  
Hez nedikir insanê qîlêri pis

Kesî zorê nedida pîrr bi quwet  
Nûr bû wucudê wî, xweş lê bihn dihat

Tewazû, dilê xwe yî binizm bû pîrr  
Qe hez nedikir wî meri kîbir

Rûyê reş, çav belek, wek çati birî  
Nûr bû li linga bigre heta sêrî  
Eger rokê derketa der bi şevê  
Şewqê nûrê, qey bê ro vêdikeve



Ewreki sipî ser wî çex dibû him  
Xwedê gotiye 'li ser wî sî be tim'

Carê binêre li vê mucîzate  
Xurme çand û fêki da wê l'wê satê

Eskerê xwe herbê ti bûn, nedin av  
Tinan esker pirr bihteng bûn, hatin rev

Tiliyan da av herikî, hat birîn  
Vexwarin avdest hêland, nimê kirin

Him heywanetê wana av da Rêsul  
Di avê da ew deran gî bibûn gol

Bi selawatê rihî wî şad bikin  
Çar yara, him eshabê wî bîr mekin

Çar yarê wî Ebu Bekir, him Omer  
Osman, Elî, ser wan ra ti nebûn mêr

Çito ku îman kir wana wê çaxa  
Dan deriyê mal û mulk, can ewladê xwe

Ehbabê vî ne, bizanin hûn  
Rihê wan ra fatihakê bixwînin

Rizaelillahil fatiha

Amedekar: **Hilmî Yeşiltaş**



CD ya Cejno ya nu derket.  
Li edresa Bîrnebûnê peyda dibe.

Di dîroka îslamê de gelê kurd jî gelek alimên bilind û derxistine. Vê yekê tesîra xwe li ser xelkê kurd kiriye ku hinek tiştên îslamî ji bo wan jî bûye adet û tore. Di mirinan de, di şûştin û rakirina cenazeyên xwe de, di şîn û taeziyên xwe de ew van adet û toreyên xwe bi zimanê kurdî dikin. Ew carina ayetên Qurana pîroz û hedîsên cenabê pêxember bi erebî jî bi lêv dikin lê ji cemaeta dora xwe re jî dîsa bi kurdî tefsîra wan gotinên pîroz dikin.

Lê di van demên dawîn de mele û miftî bi destê dewletê weke karmend têne tayînkirin ku weke şert ew di van şîn û taeziyan de, di rakirin û definkirina miriyan de zimanê tirkî bi kar bînin.

Bi amadekirina vê nivîsa cenabê M.Huseyn Êsî, em dixwazin careke din bala xelkê xwe bikêşin ku li gor şert, ferz û sunetên dîne îslamê me kurdan jî ziman, adet û toreyên xwe hene.

(\*) Li gel hinek çewtiyên gramerî jî me nexwest em destkariya kurmanciya birêz M.Huseyn Êsî bikin, me xwest weke xwe bimîne.

Bîrnebûn

## DÎ ÎSLAMÊ DE CENAZERAKIRIN û PIŞTÎ WÊ (DÎ VÊ HELWESTÊ DE TORE û ADETÊN KURDAN ÇAWANE?)

Pesn û sipasî her ji bona Allah Teala bin ku ew aferinêrê heyinê ye. Dirûd û silav li ser xwendê me Muhammed Mustefa bin ku jî bo me rehber û mehder e, li ser malbat, heval û yên ku şopa wî dimeşînin heyani roja qiyametê.

Ji bo ku ev mijar baş bête fêmkirin lazîme em li ser çend sernivîsan rawestin da ku mijar baş bête zanin û xwendevan sûde jê wergrî. Belê sernivîs li gorî jêr in:

- 1- Dema merivek nexweş bikeve
- 2- Dema ber sekeratê ango dema ber mirinê de
- 3- Piştî ku mir; techîzkirina merivê mirî
  - a- Şuştina yê mirî
  - b- Kefenkirina wî
  - c- Nimêjkirina li serê
  - d- Definkirina wî ango veşartina mirî di gorê de
- 4- Dana isqatê (kefareti) ji ber yê mirî ve
- 5- Ta'zaiya (Serxweşiya) xwediyên mirî

### 1- DEMA MERİVEK NEXWEŞ KET LAZİME EM ÇI BIKÎN?

Dî nav kurdan de dema merivek nexweş bikeve der û dorê wî diçin serdane wî; teseliya wî dikin û jê re dua dikin. Gelek şerm û fêhtiye ku merivek nexweş bikeve, vêca cîranên wî, gundiyan wî û der û dorên wî neçin seredane wî nexweşî. Heta di nav me kurdan de gotinek heye ku dibêjin: "Dî nexweşiya me de jî seriyek li me neda". Mana wê ev e; çî dibe bila bibe. Lê deme nexweşî hat, tevê hêncetan tén rakirin û ji neçûna bal nexweşan re mazeret namîne.

Ev tore û adet di eynê wextê de ji usulên (bingehên) îslamê ne jî, lewra; peyxemberê îslamê Hz. Muhammed (s.a.w.) dibêje: " Heqê merivê musulman li ser musulmani şeş in.

**Yek ji wan ji; "serilêdane nexweşan e".** Di hedisa Peyxember de binech e ku peyxember serî li nexweşan dida û ji wan re ev dua dikir: "Xwedêyo! Hey gelî Xwedayê mirovan! Ji vî merivî nexweşî û xerabiyê bibe. Wî şefa bike, her tu yî şefaker, ji şefakirina te pê ve tu şefa nin e, şefayêke ku nexweşî li serê nemine". Êdî ev usula Îslamê bûye urf û adet di nav kurdan de ku her dem diçine ziyareta nexweşê hev.

## 2- DEMA ÎNSAN KETE BER SEKERATA MİRINÊ DE

Me weha ji bav û kalan dîtiye: dema merivek di kete ber mirinê: seydayê gund, rihspî û zanayên gund li ser yê bermirinê amade dibûn. Jê re dua dikirin û li serê sûreyê "Yasîn"ê dixwendin. Seydayê gund, bi dengê normal "Lailaheillallah" dubare dikir. Ev rewş heya rih (can)ê xwe teslim bikira dewam dikir.

Dema em li qewêtiya Peyxemberê Îslamê dinêrin; em dibînin ku ev urf û adetên kurdan mîna fermanên Îslama pîroz e: "Visa ji Pêxamber (saw) hatiye ragihandin ku gotiye: Kî ku peyva wî ya herî dawî لا إله إلا الله - "Lailaheillallah" be, wê here cennetê. Naxwe divê mirov vê kelimeya pîroz bi yê di ber mirinê de bide gotin. Lê divê ru lê neyê danin ançex di bera bê avêtin.

Di hediseke şerif de weha hatiye ragihandin: "Li ser nexweşên xwe yê bermirinê de sûreyê "YASÎN" bixwinin".

Di ber mirinê de ji bo ku çavê mirî vekirî nemine lazim e meriv çavê wî bigre. Dema meriv çavê wî girt baş e ku meriv wiha bibêje:

اللَّهُمَّ اغْفِرْ لِقُلُوبِنَا (بِاسْمِهِ) وَارْفَعْ دَرَجَتَهُ فِي الْمَهْدِيِّينَ، وَاخْلُقْ فِي عَقِيهِ فِي الْغَائِبِينَ، وَاعْفِرْ لَنَا وَلَهُ يَا رَبُّ الْعَالَمِينَ، وَافْسَحْ لَهُ فِي قَبْرِهِ وَنُورْ لَهُ فِيهِ“

"Xwedêyo! Tu filankes bibaxişîne, meqamê wî di nav yên serwestkiri de bilind bike û tu li duv wî dinav yên saxmayî de bibe karsiparê wî. Me û wî bibaxişîne, Hey perwerdegarê hayinê! Tu gora wî jê re fereh bike û tu wê (gorê) jê re rohnî bike."

Dema musibetek bê serê merev yan dengê mirinê bibihîze: eger yê mirî xwediyê merev be weha tê gotin:

يَا اللَّهُ وَإِنَّا إِلَيْهِ رَاغِبُونَ اللَّهُمَّ اجْرِنِي فِي مُصِيبِي وَأَخْلِفْ لِي خَيْرًا مِنْهَا“

"Hemin em malên Ellah Te'ala ne. Û birastî emê her vegerîne balê ve, Xwedêyo! Tu min di musibeta min de xwedanxêr bike û tu bi awakî baştir ji min re, şûna wê dagire."

Eger yê mirî yekî zerib be weha tê gotin:

يَا اللَّهُ وَإِنَّا إِلَيْهِ رَاغِبُونَ

"Hemin em malên Ellah Te'ala ne û bi rastî vegeva me her bibal wî ve ye."

## 3- PIŞTÎ MİRINÊ

Piştî ku jiyana xwe ji dest da ev wezîfeyên han li ser mirovan pêwîst dibin:

- Eger ku li gund bin li tevê gundiyan tê gazikirin ku cenaze heye kesek xwe nedin alî. Gundî karê xwe betal dikin û ji bo ku cenaze ji erdê hilinin di her karî de seferber dibin. Hin ji wan gorê (qebirê) dikolin, hin ji wan ji bo şuştina wî haziriyê dikin, hin kefen hazir dikin û her wiha... eger ku li bajara bin; dîsa di hoperlorê mizgeftê de li taxa ku merivê mirî lê disekine gazî dikin da ku xelk bi arikariya hev cenaze rakin.
- Şuştin e.** Wezîfeya ewil di techîzkirina merivê mirî de şuştin e. Di bin rênîşandana seydayê gund yan ji seydayê mizgefta mehelle de du heb meriv li gorî quralê Îslamê cenaze dişon û destmêja wî digrin.

- c- **Kefenkirin e.** Piştî şuştina wî: cenaze kefen dîkin û dixin tabûtê, piştî wê wî dibin mizgevtê anjî nimêjgehê da ku li serê nimêj bikin. Di vê esnâyi de heyani gor (qebr/tirb) hazîr bibe xwendevan li serê Qurana piroz dîxwênin.
- d- **Nimêja cenaze ye.** Piştî şuştin û kefenkirinê cenaze dibin mizgeftê eger ku li gundan bê û eger li bajaran bê dibin nimêjgehê ya ku jibo nimêja cenaze hatiye terxankirin. Piştî ku nimêja cenaze hatekirin, vêca wî dibin goristanê û li wê derê tete definkirin.

Dema mirov mirî bixê gorê/tirbê yê bibêjê:

بِسْمِ اللَّهِ وَعَلَى سُنَّةِ رَسُولِ اللَّهِ

"Binavê Xwedê û li ser rêça Pêxemberê Xwedê Te'ala."

Piştî definkirina (binaxkirina) wî تمام bû:

اللَّهُمَّ اغْفِرْ لَهُ اللَّهُمَّ تَنَّةً

Xwedêyo! Tu wî bibaxişîne. Xwedêyo! Wî li ser kelima tewhidê bi hêle."

Piştî definkirin û telqînxwendinê herkes bela dibe êdî li mala cenaze ji bona "ezaiyê" ronîştin tê lidarxistin.

#### 4- DANA ÎSQATÊ (kefaretî) JÎ BER YÊ MİRÎ VE

Li Kurdistanana bakur ya ku ez tê de dijîm dema însanek bimre bi mebesta ku "roji negirtiye an sond xwaribe anjî tişteki din ku kefaret pêwîst dîke" ji bo rakirina wî mafê Xwedê li serê kefaret tete dayin ji feqîr û hewcedarên li wê derê. Ev kefaret, dibe ku tu xwarin bide û dibe ku tu pere ji bide xîzanan. Ev mijareke bi serê xwe zêde berferex e. Em nikarin di vê gotarê de bi bi tefsîlat wê şîrove bikin.

#### 5- TA'ZAYÎYA (serxweşiya) XWEDIYÊN MİRÎ

Weke me gotî piştî ku techîz (şuştin, nimêjkirin, kefenkirin û definkirin) a merivê mirî تمام bû êdî li malbata merivê mirî hazîriya ezaiyê (serxweşiyê) tetekirin. Ango ji bo runîştina serxweşiyê cihê tete amadekirin û li wê derê xwediyên merivê mirî ji bo ku yên werin serxweşiyê qebûlbikin, rûdinin.

Berê ev cihê rûniştinê eger ku di demêke serma de be; di malan de rûdiniştin.

Lê eger demêke germ de be, ye li ser banan yan ji li ber malan rûdiniştin.

Belê iro rewş hatiye guherandin. Di gelek gund û bajaran de ji bona şîn û şahiyê yan odeyên taybet yan ji çadîrên taybet hatine çêkirin û di wan de şîn û şahî tete kîrin.

#### 6- AWAYÊ SERXWEŞIYÊ

##### 1- Li mala serxweşiyê

Herwekî hûn dizanin dema ji malbatekî merivek jiyana xwe ji dest bide; hizn û xemgînî, derd û kul dîkevin malbatê, xweza dema yê mirî ciwan be yan ji bi felaketekê çûbe hizn û xemgînî pirtir dibe. Êdî ji bo sivikkirina derd û kovanên malbata yê mirî der û dorên wan, xîzm û cîranên wan tene serxweşiya wan. Di pirtirê herême Kurdistanê de ya herî meşhûr di nav kurdan de weha ye:

- a- Li hinek herêman -ku ev a ya herî baş e û bêtir nêzîki usûlên Îslamê ye- nahêlin ku di malbata merivê mirî de xwarin bête çêkirin. Heyani sê rojan cîranên malbatê bi nobet (bi dor) ji malbat û mêvanên wan yên ji dûr hatin re xwarinê çêdikin û ténine mala xwediyê ezayê (serxweşiyê). Ev a sê rojan dewam dîke û di dawîya rojê de rûniştina jibona serxweşiyê belav dibe.



- b- Li hinek herêmên din -digel ku ev rewş ji teref zana û seydayan ve nayê qebûlkirin ji- li mala xwediyê serxweşiyê ji bo mêvanên ku ji der û doran tîn xwarin tête çêkirin û mêhvan li mala serxweşiyê nan dixwûn. Di vê rewşê de serxweşivanên ku ji der û doran tîn ji, li gori hejmar û rewşa xwe ji mala malbata yê mirî re hin masrefê (pere, pezek, torbeyek şeker, tenekek rûn û herwiha...) bi xwe re tînin.
- c- Li hinek herêmên din ji bi bandora zana û seydayan ev xwarindayîn a ji teref malbata yê mirî ve hatiye betalkirin, bes duaya xwe dixwînin û çaya xwe dixwînin û diçin.

### 3- Yên ku têne serxweşiyê

Eger ku li gundan bin gundî û digel Seyda (Îmam)ê xwe, eger ku li bajêr bin cemaet digel Seydayê xwe bi hev re diçin ezayîya mala serxweşiyê. Dema diçin merivê malbata serxweşiyê wan pêşwazî dikin û li cihê ku jibona runiştinê hatiye amadekirin rudinênin. Dema rudinênin; Seyda weha dibêje:

إِنَّ لِلَّهِ مَا أَخَذَ، وَلَهُ مَا أُعْطِيَ وَكُلُّ شَيْءٍ عِنْدَهُ بِأَحْلَى مُسْمًى، فَتَعَصَّرْ وَتَحْتَسِبْ

“Birstî her malê Allah Te’alaya, tiştê ku wî sitandiyê. Ya ku dayîyê ji her malê wî yê û ji her tiştî re civanekî diyarkirî heye. Vêca (bila xwediyê mirî) xwe ragire û bera xêra xwe li nik Allah Te’ala misoger bizanibe. Lê ye herî meşhûr dinava Kurdistan de ev e:

أَعْظَمَ اللَّهُ أَحْرَاسَكُمْ، وَأَحْسَنَ عَوَاءَكُمْ وَغَفَرَ اللَّهُ لِعَيْبِكُمْ

إلى روح المرحوم / المرحومة الفاتحة

“Xwedayê Te’ala xêra we mezin bike û sebra we rind bike û miriyê we bibaxîşîne. li gunehên wî bibûre. Ji bona ruhê merhûm re Elfatîhe. Êdî tevekê cemaeta li wir hazir jê re dua dikin û sûretê Fatîhê jê re dixwînin.

Paşî Seydayê bi wan re ji cemaeta hazir re li gor rewşê sohbetêke dîni dîke, tevê cemaetê ji bi awayekî aram û rêzgirtinî lê gohdarî dikin. Paşê dişa ji merivê mirî re fatîheyê dixwînin û radibin.

Ev rewş her çiqas cemaetek yan xelkê gundekî werin her wiha berdeyam e.

### DUAYA SERDANA GORISTANÊ

Di Îslamê de -bi taybetê ji ji mêran re- ji bo du mebestan sunet e ku meriv here ziyareta goristanan.

- 1- Ji bona ku meriv mirinê bine bira xwe da ku xwe jê re, bi kar û kiryarên qenc amade bike.
- 2- Ji bona ku meriv ji xelkê tê de re dua bike. Lewra sabit e ku dema meriv diçe qebristanan ruhê miriyan xwediyê xwe dibînin û silava wan li wan divegerînin. Lêbelê meriv dengê wan sehnake. Dema em herin goristanan sunet e ku em vê duayê bixwînin.

السَّلَامُ عَلَيْكُمْ أَهْلَ الدِّيَارِ، مِنَ الْمُؤْمِنِينَ وَالْمُسْلِمِينَ، وَإِنَّا إِن شَاءَ اللَّهُ بِكُمْ لَاحِقُونَ [وَيَرْحَمُ اللَّهُ

الْمُسْتَفِدِّينَ مِنَّا وَالْمُسْتَأْخِرِينَ] أَسْأَلُ اللَّهَ لَنَا وَلَكُمْ الْعَافِيَةَ

“Silav li we geli bawermend û misilmanên divan xaniyan de! Birstî emê ji -Xweda hizkebigihêne we [û xwedê Te’ala dilovaniya xwe li yê pêşî -ji me- û li yê dawî ke] Ez ji Xedayê Te’ala jibona me û we re xweşiyê dixwazim.”

*Ev nivîs li ser daxwaza kek Hilmi ji kovara Bîrnebûnê re hatiye amade kirin. Me gelek bi kurtî nivîsî. Lê eger di vê mijarê de ya di mijarê de daxwaz hebûn em ji wezîfeya birayê xwe yê “KURD” re amadene.*

*Silav û rêz!*

*M. Huseyn Êsî*

# „HOCALARIN HOCASI“ BİR KÜRT AYDINI: FANİ EFENDİ

Mehmet Bayrak

Asıl adı **Mehmed Abdülbaki Fani** olan , ancak bilinen yaygın adıyla **Fani Efendi**, Güney Kürdistan'daki Süleymaniye şehrinden Ahmed İnayet Efendi'nin oğludur. Fani Efendi, 1266(M. 1850) yılında Süleymaniye'de doğdu.

Küçük yaşta Sıbyan Mektebi'nde Kuran'ı hıfz edip, Bağdat'ta medrese eğitimini tamamlayarak, dönemin ünlü Bağdat müftüsü Zehavi'den icazet alır.

19. Yüzyılın ikinci yarısı ortalarında Süleymaniye'den gelip Adana'ya yerleşir ve 1876 yılında Kozan sancağına bağlı Kars-ı Zülkadiriye (Kadirli) Rüştîyesi (Ortaokulu) öğretmenliğine atanarak, burada yedi yıl çalışır. Daha sonra buradaki görevinden ayrılarak sırasıyla Kozan Nüfus Memurluğu, Aşar Başkâtipliği, Feke Aşar Memurluğu, Kozan Aşar Müdürlüğü görevlerinde bulunur. Aşar memurluklarının kaldırılması üzerine Kozan ve Feke'de bu kez müfettişlik ve malmüdürlüğü görevlerinde bulunur. 1887'de İstanbul'a gelerek sınava girip başarı gösterdikten sonra sırasıyla Cebelibereket (Osmaniye) ve Maraş

sancakları tahrirat müdürlükleri görevlerinde bulunur.

1893 Yılında Fani Efendi, bu görevinden alınarak Bingazi'ye sürülür. Bunun üzerine İstanbul'a giden Fani Efendi bazı dostlarının yardımıyla durumu düzelterek yeniden Maraş Tahrirat Müdürlüğüne atanıyor. Yazar, manzum özgeçmişinde bu durumu şöyle yansıtır:

Beni Bingazi'ye baht-ı siyahım eyledi tahvil  
İlahi sen bilirsın hâlimi bilmem ne hikmettir  
Mevani hep müheyya bende yokken bir adet lira  
Yedi etfal ile Bingazi'yi bulmak ne külfettir  
Haziran altısında 311 sal-ı malide  
Yine tayin oldum Maraş'a lutf-u Sadarettir

Sekiz yıl Maraş'ta görev yapan Fani Efendi, kendi isteğiyle ikinci kez Cebeliberek, daha sonra da Mersin Tahrirat Müdürlüğü görevlerinde bulunur. Meşrutiyetin ilanından sonra tazminatını alarak görevden çekilir ve eşinin memleketi olan Kadirli'ye yerleşir.



## Çocukları

Yukarda da vurgulandığı gibi onun (yedi etfal) i yani yedi çocuğu bulunmaktadır. Tümü erkek olan bu çocuklardan üçü, Cumhuriyet'ten sonra **150'likler** listesine alınan Kürt aydınlarındandır. Kürt literatüründe **150'lik Fanizadeler** olarak bilinen bu kişilerden **Ali İlmi Fanizade** (1878–1964) , edebiyat öğretmeni, şair ve Adana'da yayımlanan *Ferda* gazetesinin sahibidir. 1884 doğumlu **Zeynelabidin Fanizade**, Hürriyet ve İtilaf Fırkası Umumi Kâtibi yani Genel Sekreteriydi. Diğer kardeşlerden **Mesud Fanizade** (1889– 1979) ise, sürgünden sonra Paris'e giderek orada eğitim görmüş ve *Le National Kurde et son Evolution Sosyale* (Kürt Ulusunun Sosyal Gelişimi) konulu doktora tezini hazırlamıştır (1933). 1938 Affıyla ülkeye dönen yazar, aynı yıl döndüğü Hatay'da „Atatürk'ün Hayat Felsefesi“ konulu bir kitapçık yayımlamıştır. Fanizadeler'den **Dr. Baki Bilgili** ise, Türkiye'de İstiklâl Madalyası ile ödüllendirilmiş olup, 1979 Haziranında 100 yaşındayken İstanbul'da ölmüştür. Diğer üç kardeşin kimliği konusundaysa bilgimiz yoktur.

## Edebi Kişiliği

Manzum özgeçmişinde; kimsenin kendisinden şikayetçi olmadığını, kendisinin de kimseden şikayeti bulunmadığını şu sözlerle anlatır:

Beşer benden şikayet etmemiş Mevlaya şart olsun  
Kaderden ben de şekva eylesem küfran-ı nimettir

Gerçekten, memurluk hayatı belli bir düzen içinde geçen Fani Efendi'nin özel yaşamında da büyük bir saygınlık uyandırdığı, söz ustası ve hoşsohbet bir kişiliğe sahip olduğu belirtilir.

Arapça ve Farsça'ya son derece hakim; bilgin, şair ve hattat bir aydın olan Fani Efendi; ebcetle tarih düşürmekte de usta bir şairdir.

Kendi çocuklarının yanısıra çevresinde birçok gencin yetişmesine de yardımcı olur. Bütün çocuklarını okutur ve tümü alanlarında önemli bir düzeye ulaşırlar. Dönemin Adana Valisi Abidin Paşa'nın çocuklarına Arapça, Farsça dersleri verdiği gibi; Türkiye'de eserleri bilim çevrelerine kaynaklık eden **İbnülemin Mahmud Kemal İnal** gibi bilginlere de hocalık yapar. Bundan dolayı kendisi „*Hoca Fani Efendi*“ olarak da anılır.

İbnülemin, onun hocalık serüvenini şöyle anlatır:

„Babam 1886 yılında Kozan Mutasarrıflığına atandığı sırada, Fani Efendi orada Aşar Başkâtibi idi. Bana ve kardeşim Ahmed Tevfik Beye, Arap ve Fars edebiyatı ve Ta'lik yazısı konusunda ders verdi. Kendisinin edebiyattaki derinliğinden yararlandık. (...) Adana ve çevresinde pek çok genç,

üstadın bilim ve edebiyat birikiminden yararlanmıştıır.“ (İ.M.K. İnal: **Son Asır Türk Şairleri**, Dergah yay. 3. bas. 1988, s.364)

### Gazel

Senin âya esir-i dest-i gaddar olduğun var mı  
*Teselli verme candan böyle bizar olduğun var mı*

*Ser-i mu'aşkile rabt ü alâkan yoktur ey zahid*  
*Senin zülf-ü perişana giriftar olduğun var mı*

*Mariz-i aşka müşküldür şifa ey İbni Sina ah*  
*Nigâb-ı çeşm-i mahmur ile bimar olduğun var mı*

*Enelbak nârasından urma dem ey şeyb-i bi-nusrat*  
*Deminden Pir-i Mansur'un haberdar olduğun var mı*

*Beşer şeklindeki İblis-i pür- telbise aldanma*  
*Mazallah zelil-i kayd-ı mekkâr olduğun var mı*

*Nu mucizdir, ne sabir adeta bir şair-i mahir*  
*Leb-i **Fani** gibi sen de dürerbar olduğun var mı*

### Şiirlerinden Örnekler

İbnülemin Mahmud Kemal İnal, onun Türk, Arap ve Acem edebiyatının binlerce şiirini topladığı halde kendi şiirlerini toplayıp yayımlamamasını üzüntüyle belirterek, birkaç şiirini verir.

### Gazel

Baran-ı belâ yağsa semadan hazer etme  
*Tufan-ı fena bassa cihani keder etme*

*Yaran-ı safanın kadeh-i kalbini kırma*  
*„Bintülınab“ın kanını zahid heder etme*

*Âyine-i vicdanına bak çeşm-i edeble*  
*Pertevsiz olup ayb-ı cihana nazar etme*

*Manend-i sedef ağzını açtıkça güher saç*  
*Mercan gibi bir kimseyi hunin-ciğer etme*

*Ey şahs-ı fûrumaya çıkıp sadra oturma*  
*Miktarını bil meclis-i zir ü zeber etme*

*İnsaf kıl ey hayr ü şer'e muktedir adem*  
*Nefin yok ise kimseye bari zarar etme*

*Her lahza rakib ile niçin böyle gezersin*  
*Ey ömr-ü azizim ecel ile güzar etme*

*Baki kalacak âlem-i fanide sühandır*  
***Fani** bu yeter çok tama-i sim u zer etme.*

# BİRNEBÛN'UN SUNDUĞU GERÇEKLER

Mehmet Bayrak

1997 Kışında **BİRNEBÛN** yayın hayatına başlayacağı zaman, redaksiyonda yer alan arkadaşların önerisi üzerine, derginin manifestosu niteliğindeki „Çıkarken“ yazısını hazırladığımda şunları söylemiştim:

„Orta Anadolu Kürt Toplumunu çeşitli boyutlarıyla ele alıp işleyecek bir periyodik yayın, bu toplumun yarattığı kültürel değerleri kaybolmaktan kurtaracağı gibi, bu toplumun ulusal kimliğinin pekişmesine de katkı sunacaktır. Orta Anadolu Kürt Toplumunun yerleşim, siyasal ve sosyal tarihi; coğrafik konumu, dil, din, inanç ve kültür yapısı; sözlü, yazılı sanatı ve edebiyatı; gelenek ve göreneklere; etnoğrafik ve folklorik ürünleri; aşiret ve boy yapısı; yazılı ve sözlü tarihi kaynakları; sosyal ve siyasal yapısı; iç ve dış göçleri; ekonomik durumu ve çevreyle ilişkileri gibi çeşitli konular bu periyodun dağarcığını oluşturacaktır.“ (BİRNEBÛN, Sayı:1/1997)

Ve ekliyordum: „BİRNEBÛN, bu amaçlara hizmet yolunda bir katkı sunarsa amacına ulaşmış demektir...“

